

## Siyaseta derve êdî ne girîng e?

Îro em dibînin ku dewletên nûjen bi pirsgirêkên ewqas giran re rû bi rû ne ku siyaseta derve ku li her derê dimeşîne li ber çavan e. Ev ji bo welatên rojavayî, Rûsya, Çîn, Hindistan û her kesê din derbas dibe... ***Kurdistan Lezgiyeva/R.7***



## Pirsa Socrates: Nefspiçûkî...

Agahiyên li ser Socrates ji Apolojiya Socrates bigirin heta bi berhemên dawîn jî bêtir ji şagirtekî wî tê ku navê wî Platon bû. Platon an jî Eflatûn, weke ku Ehmedê Xanî jî navê wî di Mem û Zînê de aniye...***Îbrahîm Seydo Aydogan/R.5***



## Di şaredariyan de rola jinê

Pêvajoyên demokratîk ên li Tirkiyeyê xebatên xurtkirina maf û temsîliyeta komên cuda yên civakî dihewîne. Di van salên dawî de xebatên civaka Kurd ên ji bo vegerandina şaredariyên xwe ji qeyûman weke pêşketineke girîng derketiye... ***Nalîn Aslan / R.2***


22- 28 Nîsan 2024
Hejmar: 227
Buha: 15 TL
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e




# Dem dema xweparastinê ye

Em zarokên vê axê ne ku zanibin xwe bi rehê koka vê darê qayîm pê bigirin; ne şaristanî û ne jî ti hêza wan a globalîzm dê bi me nikaribe ku jiyanê li me bi çilmisîne. Ji lew re em mirovên vê xakê ne, me hêza xwe ji cewhera dîroka vê edîngeriyê hilgirtiye, ji çemên Dicle û Feratê ava wan vexwariye. Binemaliya civakê ma ne li ser vê axê, li kûrahiya gelî û newalên wê, li ser vê rîşê şîn hatiye?

Wer xuyaye ku civaka me êdî ji rewşa heyî, kiryarên dewletê yên li Kurdistanê diqewimin geleke bi hêrs e, acize bi vê yekê nexweş e ku xwe berpirsiyar dibîne û bi xweparastina rewa bersiva tecawizkaran dide. Li hember destdirêjiyên esker, polîs, kontra û cerdevanan xweparstina rewa mafê her jinê ye ku divê zanebûna vê de be. Di vê rewşa aloz û qeyranê de ya rast ew e ku em pêşî girîngî bidin hêza xwe parastin e... ***Adar Gulan/R.2***

## Dîplomasiya şer

Tê payin ku şefê rejîma faşîst û qirker Erdogan û şandeya pêre serdana Bexdayê bike. Demek dirêje wezîrên Erdogan ji bo vê hevdîtinê bi aliyên cûda re di nava peywendiyê de ne. Tê gotin di rojeva Erdogan de têkiliyên bazirganî, peymanên petrol û meselaya avê heye. Lê yek ji mijarên girîng jî şerê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Bi taybet ev demek dirêje dewleta tirk a dagirker ji bo rêveberiya Iraqê jî bikşîne nava xeta dij-kurd di nava hewldanan de ye. Wisa diyare ku wê ev mijar yek ji rojevên herî girîng ên hevdîtina Erdogan ya li Bexdayê be. Beriya em bahsa hevdîtina Erdogan bikin divê em rewşa li herêmê, bi taybet jî rewşa li başûrê Kurdistanê û PDK'ê baş fêm bikin. Ger îro dewleta tirk wisa bi awayekî derqanûnî û terorîstî mudaxeleyî karê navxweyî yê Iraqê û başûrê... ***Felemez Ulug/R.6***

# Statû di xetereyê de ye

Piştî 30 salan cara yekem ku rewşa statûya li Başûr ewqas dikeve xetereyê. PDK, bi taybet malbata Barzanî weke qeyûman dest danîne ser destkeftiyên kurd ên ku bi berdêlên giran hatine girtin

Statûya herêma başûrê Kurdistanê cara yekem e ku ewqas di xetereyê de ye. Ji aloziya niha re çareseriyek neyê dîtin. Di nava çend mehan de herêma Başûr dikarê bê parlamento û hikûmet were hiştin. Başe sedem çi ye? Rewş çima wiha bû? Û çi senaryo têne nîqaşkirin? Tê plankirin ku di 10'ê Hezîranê de li Iraqê hilbijartin pêk bê. PDK dibîne ku beşdarî hilbijartinan bibe ew ê bi ser nekeve. Winda dike û bi rêya rewa û qanûnî neçare derveyê desthilatdariyê bimîne. PDK bixwaze jî Tirkiye vê yekê qebul nake!. Ji ber vê sedemê PDK li formulek bêyî hilbijartin digere ku desthilatdariya xwe bidomîne. Ev jî ne mûmkûn e. Ji xwe dadgeha federal gelek erkên herêmê betal kiriye. Ev yek jî her ku diçe PDK'ê tengav dike. Di rewşa heyî de 3 senaryo hene ku li ser têne nîqaşkirin... ***Amed Dîcle/R.6***




## Plana tevlîhevkirina Rojhilata Navîn


Rojhilata Navîn dikele. Bi qasî kela germê kela siyaset, şer, pevçûn û nakokiyan jî zêde dibe. Bi êrîşa Îranê ya li ser Îsraîl nepeniya pêşeroja Rojhilata Navîn zêdetir bû. Gelên Rojhilata Navîn roj tune ku bi geşedaneke nû şiyar nebin. Şer bûne şêwaza jiyana wan. Dema bê lêkolînkirin dê bê dîtin ku tu erdgnîgarî wekî Rojhilata Navîn nebûye qada şer û pevçûnan. Li Ewropayê şerên 30 salan, şerê sedsalan jî negihîştine asta pevçûnên li vir. Bi sed salan e nakokiyên siyasî, olî, mezhebî, çandî, etnîkî û hwd. didomin. Îsraîlê di 2'yê nîsanê de li Sûriyeyê êrîşî balyozxaneya Îranê kir. Di encama êrîşê de gelek fermandarên artêşa Îranê hatin kuştin. Hinek ji van fermandaran endamê muhafizên şoreşê bûn... ***Zinar Ronî/R.7***

## Şer îqtîdarî nêxelisneno

Seke zanîyeno weçînayîşê 31ê adare ra dima Tirkîya û Kurdistan de rewşa pêroyî vurîyaye. Êdî îqtîdarê AKP-MHPyî "serdest" nîyo. Înan lapata şarî werde. Nê rojan weşîya înan a psîkolojîye qet baş nêasena. Hem Erdogan hem zî Bahçelî her roje vera dînamîkanê welatperest, sosyalîst û demokratan ziwanêkê "hêrişkarî" xebitnenê. Îqtîdarê AKP-MHPyî seba ke "hişê" şarî bibedilno, nê rojan hewcedarê şer û pêkewtişî yo. Her rejîmo otorîter xora wina yo. Şer seba înan ge-ge "xelisnayox" beno. Erdogan planê hêrişkerdişê Başûrê Kurdistanî keno. Bi nê hawayî îdareyê Bagdadî û PDK ra hetkarîye wazeno. Eke mabênê terefan de peymana asayîşî bêro îmzekerdene, o wext hukmatê Bagdadî do îstîxbarat peyda bikero û îşxalê Tirkîya do rewa bikero... ***R.9***

## Rojnameya yekem a Kurdistanê 126 salî ye

Di serdema ku rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike da, rûmeta rojnameyan gelek zêde dibe. Hecî Qadirê Koyî yê ku di gelek çavkaniyan de wekî mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan tê nîşandan, zêde li ser girîngiya rojnameyan rawestiyaye. Rojnameya pêşîn a bi kurdî Rojnameya Kurdistanê ye. Wek hemû rojnameyên cîhanê, rojnameya Kurdistanê jî piştî pêvajoyeke dûr û dirêj a di qada çapemeniyê da karibûye derkeve pêşberî xwendevanan. Ji bo ku baştir mijar bê fêmkirinê pêwîst e em bi gelemperî li ser dîroka çapxane, çapemenî û rojnamegeriyê hin agahiyan bidin...
***Ahmed Kanî/R.8***




## Serdema Mezolîtîkê

Ji roja me ya îro gelekî dûr di serdemên kevnar ên dîrokê de bi pêşketina hişmendiya mirov ve şert û mercên jiyanî, çandî û civakî pêş dikeve. Her çiqas ev dem serdem ji me dûr be jî bi dane û delîlên ku ji aliyê mirovên zanist ên...***Rohat Bûlût/R.11***

## Hevpeyman dê bibe mînak

**Jiyan Huseyîn diyar kir ku hemû zagon bi destê mêran hatiye nivîsîn û got: "Jin ji nedîtî ve hatine. Me jî pêwîst pê dît ku peymaneke jinan amade bikin. Amadekariya nivîsandina hevpeymanê dikin...** ***Hevpeyvîna Medya Bal/R.4***

## Ziman û hilberîn

Mirov ji bo ku bijî, xwe biparêze û debara xwe bike pêşî bi xwezayê re têkiliyê datîne. Di vê têkiliyê de pêrgî gelek tiştên ku nas dike û nas nake belê pêdiviya wî/wê pê heye dibe. Ji bo ku ji wan tiştan sûdê wergire; hem wan bi kar tîne û hem jî tiştekî li wan zêde dike. Ew zêdekirin jî hilberîneke domdar û misêwa bi xwe re tîne. Ji bo wê, meriv dikare mirov wekî heyinekî biaqil, hilberîner û civakî pênase bike. Lewre hişmendiya mirov, hilberîneriya wî/wê, hilberîneriya wî/wê jî civakîbûna wî/wê derdixe holê. Mirov tiştên ku dibîne tenê bi bi nav nake; heman demê tiştên ku difikire, disêwirîne û xeyal dike jî bi nav dike. Ziman, bi jiyana civakî, ezmûn û zanîna kesên din re pêk tê û pêşve diçe. Pêketina zimanê civakekê rasterê girêdayî hilberîn(eriy)a wê ye. Hewce ye ku mirov li gel gerdûna şênber... ***Adar Jiyan/R.5***

# Niha dem dema xweparastinê ye

Ji bo hêza xweparastinê pêdiviyên me hene. Em jin bêtir dizanin ku li cîhanê dema jin xwe neparêze bi kuştinê re rû bi rû dimîne. Niha dem dema wê ye ku jin li dijî qirkirinê xwe biparêze



Adar Gulan

Em zarokên vê axê ne ku zanibin xwe bi rehê koka vê darê qayîm pê bigirin; ne şaristanî û ne jî ti hêza wan a globalîzm dê bi me nikaribe ku jiyanê li me bi çilmisîne. Ji lew re em mirovên vê xakê ne, me hêza xwe ji cewhera dîroka vê edîngeriyê hilgirtiye, ji çemên Dicle û Feratê ava wan vexwariye. Binemaliya civakê ma ne li ser vê axê, li kûrahiya gelî û newalên wê, li ser vê rîşê şîn hatiye?

Wer xuyaye ku civaka me êdî ji rewşa heyî, kiryarên dewletê yên li Kurdistanê diqewimin geleke bi hêrs e, acize bi vê yekê nexweş e ku xwe berpirsiyar dibîne û bi xweparastina rewa bersiva tecawizkaran dide. Li hember destdirêjiyên esker, polîs, kontra û cerdevanan xweparstina rewa mafê her jinê ye ku divê zanebûna vê de be. Di vê rewşa aloz û qeyranê de ya rast ew e ku em pêşî girîngî bidin hêza xwe parastin e.

Her çendî dereng jî mabe, ketina ferq û zanabûna xeterî, êrîşên heyî yên ser rûmeta civakê û rastiyên wê dîtin, xwe parstin meriv bi vê helwestê kêyfxweş dibe, ji xwe ya rast jî ev e ku hişmendiya xwe parastinê li gel bîra her ferdê civakê bi pêş bikeve. Zanîn bîra civakê, cihê şanaziyê ye. Civak û jina ku heqîqeta xwe wenda nekiribe, ji niha û şûnde dê nikare bi pergaleke wiha re bimeş e...

Beriya bi çend rojeke sekna gelê Şirnexê ku di kêliyê de helwesta xwe raber kir û dersa 'eskerê' ku heweskir bû destdirêjiyê li jineke bike, bi şêwazê xwe parastinê li hember vê êrîşê helwesta xwe danî. Mêtingeh zanibin ku xelkê vê herêmê 'we li welatê xwe naxwaz ê', ji bilî dagirkirin, xirabî, neqencî û talankirina xwezayê, çi fede we higaye vê civakê? Loma jî mêjiyê civakê, we barbariya kolonyal li ser xwe qebûl nake.

Dewlet bi salan e di nav hewldana ku bajarê Şirnexê, ji sivîlan xalî bike, bajêr veguhêze qişlayeke eskerî bi vê boneye ji bo vê xizmet dike. Çi kare çawîşê pispor Zekerya Çelîk, li nav taxên bajêr ê Şirnexê heye? Weke her care ku dikirin vê carê jî walî bi daxuyaniyeke xwest êrîşa tacîzê ya eskerê bi navê Zekeriya Çelîk, bin cilkê bike. Bi daxuyaniyên vik û vala xwest êrîşê manîpile bike û rê li ber tepkiyên civakê û saziyên hiqûqî bigr e. Lê şêniyên Şirnexê bi destwerdana ku kir re rastiya êrîşê dexist holê.

Zihniyeta mêtinger her ku rê li ber darizandina bûyarên destavêtinê yên li Kurdistanê girt, êrîşên destdirêjiyê li ser jinan zêdetir bûn. Ji bo ku bûyerên bi vî ewayî di ragihandinê de cih neyê dayîn polîtîkayek taybet a dewletê ya şerê taybet dixin dewrê.

Bi rastî ev ne cara yekem e ku dewlet li Şirnexê, li ser sûc hatiye girtin; di hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê de bi hazaran polîs, esker, mafya û kontra ji bajarên Tirkiyeyê bi balafiran derbasî bajarên Kurdistanê kirin ku li hemberî vîna gelê kurd dengê xwe bidin AKP'ê. Ê yek ji wan bajaran jî, bajarê Şirnexê bû... AKP'ê, bi dengê wan hêzên paravan ên para-milîter şaredariya bajarê Şirnexê xesp kir, desteser kir! Wê çaxê jî gelê Şirnexê helwesta xwe li dijî hilbijêrên "qeyûm" danî û ji dewletê re got, "li hemberî vîna min tu sûc dikî, bêrêziyê dikî."

Ji şêniyên Şirnexê apê Suleyman Salgucak li ber deriyê dibistanê ji koma esker û polîsan bi wê pirsiyariya dijwar, "bêje, tu kî yî, ji ku hatî" ji zihniyeta barbar hesap pirsî. Bi vê têgihiştine rihê demê, ahenga yekîtiyê ava dike. Bi vê pirse, ne mêtingeh ne jî bindestiyê qebûl dike...

Mînakek din ku di hişê mide cih girtî ya herî bi êş beriya bi çend mehan li Wanê qewimî bû, bi rêya ragihandine bû roj ku zaroka 16 salî rastî destavêtina 40 zilamî hatiye ku di nav de polîs, esker û karmend jî debûn e. Bûyer li naveça Wanê ya Bêgirê qewimî bû. Li ser wê êrîşê ya destavêtina zarokê çima hate girtin sedemên wê tam çi bû nizanim, lê zarok li nava rastê ma, ew bêxwedî, bêkes û kûs mabû! Ji sazî û rêxistinên jinan jî di vê derbarê de ti daxwuyanî nehatin dayîn. Ji malbata zarok jî, ti kesê/î tiştek ne gotin...

Çi dema ku êrîşên tacizê li Kurdistanê dibe rojev waliyên dewletê li ser navê esker û polîsên tecawizkar di kêliyê de daxuyaniya, 'serxweş bû', an jî dibêjin, 'ew ne li ser hişê xwe bû' didin. Walî, bi van daxuyaniyan xwedî li esker û polîsên tecawizkar derdikeve. Bi xwe aşkera dibêjin ku ew şivanê berdoşan e.

Heta ku xweparastin tinebe, ne negaze ku jiyana azad bi pêş bikeve. Bi xweparastinê jiyan bi ewlehî dibe. Civak jî divê vê rastiyê hîn baştir bibîn e. Ji ber ku her civak, her nifş û her bajar kefîlê xwe û parastina ruhê xwe dike.

Bi bêxemî nêzî meselê bûyîn, hêvî û çareserî pêk nayê. Ev ne dema ku meriv rûne û li êrîşan temaşe bike. Li gorî lîteratura çanda şoreşê, ji bêdengî û bêhelwestiyê re, 'bê têkoşînî' tê gotin ku meriv xwe ji bîra ve neke. Di vê der barê de lêkolîn û derxistina zanebûna ji ezmûnên dîrokê, ji kêmasiyên heyî bi temamî hîna jî derbaskirina wan çênebûye. Sînerjî, ti demê ji bêdengiyê, gurnebûye.

Xwe gihandina ruhê dem», bi fêmkirina hêza xwe rêxistinkirine ku ji bo wê helwestên heyî divê tenê bi herêmekî re bi sînor nemînin. Ji bo mezinkirina têkoşînê hincetên me hene û gelek in, ji bo hêza xweparastinê pêdiviyên me hen e. Em jin bêtir dizanin ku li cîhanê dema jin xwe neparêze bi kuştinê re rû bi rû dimîne. Niha dem dema wê ye ku jin li dijî destavêtin, taciz, fihûş, êrîşên qirkirinê û xizaniyê xwe biparêze. Ji ber wê li dijî destdirêjiya ser jinê derketin, hinceta me ya berbelavkirina têkoşînê ye...




# Di şaredariyan de rola jinê



Nalîn Aslan

Pêvajoyên demokratîk ên li Tirkiyeyê xebatên xurtkirina maf û temsîliyeta komên cuda yên civakî dihewîne. Di van salên dawî de xebatên civaka kurd ên ji bo vegerandina şaredariyên xwe ji qeyûman weke pêşketineke girîng derketiye pêş. Ev pêvajo aliyên cuda yên têkoşîna demokrasiyê û girîngiya beşdariya civakî radixe ber çavan. Di vê pêvajoyê de rola jinan di rêveberiyên herêmî de ji têgeha "kotaya jinan" derbas bû û nîşan da ku pergala "hevserokatiyê, temsîliyeta wekhev" ku modela jin û mêr bi hev re bi rê ve dibin, gaveke rast e.

Pergala "Hevserokatiyê, temsîliyeta wekhev" ku di sala 2014'an de dest bi tatbîqatê kir, rola jinan a di şaredariyê de tenê ji pozîsyona sembolîk derxist û hişt ku ew di nava pêvajoyeke rastîn a biryarê de cih bigirin. Bi vê pergalê re şaredarên jin ne tenê feraseta ku jin dikare xwe bi rêve bibe hilweşand, ji civakê re jî nîşan da ku rêveberî bi hevkariya jin û mêr pêkan e.

Jinan ne tenê di siyasetê de, di şaredariyê de jî pêwîstiya xwedîderketina li siyasetê nîşan dan. Tevlîbûna jinan rêveberiyên herêmî berfirehtir û adiltir kiriye. Li bajarên kurdan hilbijartina şaredariyên jin, gaveke girîng bû ji bo jin hêza xwe di siyasetê de nîşan bidin. Ev jin ne tenê di nava civakên xwe de, li tevahiya welat bûne sembola demokrasî û wekheviyê.

Di şaredariyê de rola jinan tenê bi serokatiyê re ne sînordar e. Her wiha di meclîsên şaredariyan, meclîsên taxan û yekeyên rêveberiyên herêmî de bi awayekî aktîf cih digirin û beşdarî pêvajoyên biryardanê dibin. Ev yek dihêle ku biryarên demokratîk bi perspektîfek berfireh werin nirxandin û hewcedariyên beşên cuda yên civakê li ber çavan bên girtin.

Lê belê di mijara tevlêbûna jinan a di şaredariyê de divê gavên zêdetir bên avêtin. Divê di asta rêveberiyê de nûnertiya jinan bê zêdekirin û zêdetir tev li pêvajoyên biryardayînê bibin. Di heman demê de pêşxistina kapasîteyên pêşengiya jinan bi perwerde û bernameyên piştgiriyê girîng e. Divê em ji bîr nekin ku têkoşîna demokrasî û wekheviyê ne tenê di hilbijartinan de di jiyana rojane de jî didome. Tevlêbûna jinan a di şaredariyê de parçeyek girîng a vê têkoşînê ye. Ji bo siberojê civakek adiltir û berfirehtir, divê dengê her kesî were bihîstin û nêzîkatiya rêveberiyên herêmî ku her kes tê de temsîla xwe tê de hebe, were pejirandin.

Hêza demokrasiyê ew e ku cudahî bên cem hev û pêşerojeke hevpar ava bikin. Rola aktîf a jinan a di şaredariyê de wê vê hêzê hîn zêdetir bike û di hemû qadên civaka me de rê li avakirina nîzamek dadperwertir bigire. Dema ku em bi hêvî li pêşerojê dinêrin, divê em nirxên bingehîn ên demokrasî û wekheviyê bidomînin.

# Çepgirî û bêdengî



Biyan
Munewer Azîzoglu Bazan

Ku tevger û rêxistinên çepgir, civakî û femînîst di bûyerên civakî de ne xwedî helwesteke wekhev in û heta di gelek awayan de bi nakok tevdigerin, mixabin rastiyeke nikare bê veşartin e. Ev rastî dikare ji gelek xalan ve bê şîrovekirin, helwest û seknên bîrdozî, berjewendiyên cuda (her çiqas ji bo aliyên çepgir berjewendiyên gelên bindest diviyabû li pêş ba jî), têkiliyên bi hêz û serdestiyê û herweha pêşketinên dîrokî û erdnîgarî dikarin di vê cudabûnê de rolên xwe bilîzin. Em vê nakokiyê di çarçoveya mijara kurd de di navbera çepgirên Tirkiyê û Kurdistanê de jî dibînin.

Ez rêxistinên kurd li derveyî mijarê dihêlim, ji ber ku ne hemî kurd û rêxistinên xwe çepgir in û xwezahî ye ku perspektîfên cuda biparêzin. Lê di bûyerên cîhanî de, yên tê de hêzên serdest û komên bindest tên hemberî hev, mirov li bendê ye ku tevgerên çepgir li aliyê bindestan bisekinin. Lê ev ne her tim gengaz e. Mînaka herî dawî me di nêzîkatiyên li hemberî şerê navbera Îsraîl û Filistînê de dît. Bi taybetî di çarçoveya Almanyayê de ev bûyer rewşa sosret a ku çep bi giştî tê de ye diyar kir. Di vê gengeşiyê de yê ku ez pir ecêbmayî hiştim, nakokiya helwestên aliyên piştgir/şermezarkir bû. Ez vê jî dixwazim di mînaka çepgirên alman de nîşan bidim.

Di dema êrîşa Hamasê de çepgirên alman (ku ew jî wekî çepgirên tirk, ji gotina çepgirên alman acis in. Lê ez almanbûnê ji hêla heremê ve bi lêv dikim û ne wekî netewekê) û femînîst ji carekê ve bûn du alî, heta sê alî. Aliyeke yekser piştgiriya xwe ya bi Îsraîlê re diyar kir û vê yekê wekî dewleta alman wek "Staatsräson" (mirov dikare wekî xeta sor a dewletê, bingeha hebûna dewletê wergerîne. Ji bo baştir bê femkirin, di çarçoveya dewleta Tirkiyê de dijminatiya li hemberî kurdan "Staatsräson" e) nirxand û bê îstisna li aliyê dewleta Îsraîlê sekinî. Ev yek pirî caran bi dîroka nazî û sucdariya Almanyayê ve tê şîrovekirin ku rastiya wê jî heye. Ji ber vê sedemê ye ku wexta li herderê cihanê ji bo piştgiriya bi gelê Filistînê re çalakî hatin lidarxistin, li Almanyayê çalakiyên ji bo piştgiriya Filistînê û şermezarkirina şîdeta Îsraîlê hatin qedexekirin. Aliyekî din ê hindik ê çepgiran jî aliyê gelê Filistînê girtin û heta slogana "Filistînê ji sucdariya almanan rizgar bikin" ku pir hat niqaşkirin di çalakiyan de qîriyan. Li gorî wan avakirina dewleta Îsraîlê encama komkujiya naziyan e, ku ji ber vê sedemê welatê filistîniyan wek projeyeke mêtingeriyê hatiye dagirkirin. Ev dûrişm û baweriya li pişt wê li Almanyayê pir tund hat rexnekirin û heta wek helwesteke "antîsemîtîst" hat pênasekirin. Gerçî kî li hemberî kiryarên Îsraîlê derkeve li Almanyayê yekser wekî "antîsemîtîst" tê îlankirin û teşhîrkirin. Heta fîlozofên navdar ên wekî Judith Butler, Nancy Fraser, Slavoj zizek ji ber nêrînên xwe yên ku helwesta Îsraîlê tawanbar û şermezar kirin, bi "antîsemîtîzmê" ve hatin sûcdar kirin û li Almanyayê panel, xebat û civînên wan hatin betalkirin. Di nava van herdû polên çepgir de beşeke mezin jî bêdeng ma. Qet ne him û ne gim ji wan derket. Wekî ku qet rojeveke weha nîn be, xwe bi mijarên din mijûl kirin. Ji tirsa ger aliyê Filistînê bigirin ewê bi "antîsemîtîzmê" werin tawanbarkirin û aliyê Îsraîlê bigirin jî dê wekî alîgirê dewletê bên dîtin, xwe spartin sedema "li me nakeve em dewleta Îsraîlê bi komkujiyê, bi rejîma apartheidê sûcdar bikin û boykot îlan bikin, li cihê ku kal û pîrên me bi mîlyonan cihuyan qir kirin." Di vê aliyê bêdeng de yên herî leqayî rexneyan hatin jî rêxistinên femînîst bûn. Sûcdara hevpar hatibû dîtin: jin.

Çepgirên li du polan di tawanbariya jinan de lihev kirin. Ji hêlekê de rastiya ku êrîşa Hamasê êrîşeke zayendperest a sîstematîk bû û ji hêla din de di bin êrîşên Îsraîlê de herî zêde jin û zarok bûn qurbanî, careke din ruûyê zayendî yê şer û qirkirinê nîşanî me da. Yên alîgirê Îsraîlê femînîstan rexne kirin ku qaşo ew Hamasê şermezar nekirine û alîgirên Filistînê jî digotin ku femînîst şerê Îsraîlê yê li dijî sîvîlan rexne nekirine. Gorî wan femînîzm di nakokiya Rojhilata Navîn de têk çiûbû. Lê rastî ne tenê femînizm, hemî rêxistinên çepgir ên ku di bûyerên mirovî de helwest diyar nekin, bi têkçûnê re rûbirû dimînin.

Bi taybetî bêdengiya vî aliyê gorî min dibe sedem ku tiştê herî mirovî û hêsan nikare were gotin. Li gorî min gotina Primo Levi, ku ji Auschwitzê xelas bibû, "Ev buyer (genozid) careke çêbû, û ji ber vê yekê (genozîd) dikare dîsa biqewime", nikare tenê di çarçoveya komkujiya li hemberî cihuyan de were bilêvkirin. Li ser rûyê dinyayê şer û pevçûn diqewimin û her roj mirov bi komkujiyan re rûbirû dimînin. Ger çepgir nikaribin bê şert û merc li hemberî hemî komkujiyên li ser rûyê erdê derkevin, di navbera wan de kategoriyan ava bikin, wê demê ew ê heta hetayê mehkûmê bêdengiyê bibin. Lewre yê ku wan bêdeng dihêle ev nakokî ye, ku nikarin xwe jê xelas bikin.

# Tirkiye nahêle CPT raporê aşkere bike

Parêzer û malbata Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, têkildarî tecrîda mutleq bi rayedarên Konseya Ewropayê re hevdîtin kirin. Prz. Ozgur Faîk Erol diyar kir ku Tirkiye naxwaze CPT raporê aşkere bike

Yilmaz Yilmaz

Şandeya ku parlamenterê Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) ê Rihayê Omer Ocalan û yek ji parêzerê Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Ozgur Faîk Erol jî di nav de hebû, bi Konseya Ewropa (KE), Yekitiya Ewropayê (YE), Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropa (DMME) û Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) re hevdîtin kirin. Têkildarî armanc û naveroka hevdîtinan em bi Parêzer Ozgur Faîk Erol re axivîn.

Ozgur Erol der barê armanca gera Ewropayê û serdana CPT'ê de axivî û wiha got: "Em hem ji bo bi rayedarên Konseya Ewropayê re hem jî ji bo bi nûnerên CPT'ê re hin hevdîtinan bikin hatin Strasbourgê. Bi boneya em balê bikişînin qutbûna ragihandina mutleq û rewşa pozisyona saziyên Ewropayê ku di vê mijarê de xwedî rol û ristin niqaş bikin, em hevdîtinan dikin. Em dixwazin der barê rewşa Îmraliyê de agahiyan bidin. Em dixwazin nêzîkatiya saziyên li Ewropayê ya der barê pirsgirêkê de bi bîr bixin. Armanca hevdîtinên me em erk û berpirsiyariya wan bînin bîr wan û der barê tecrîdê de wan dîsa agahdar bikin."

**Tirkiye naxwaza raporê parve bikin**

Prz. Ozgur Faîk Erol da zanîn ku hevdîtinên wan ên bi rayedarên Konseya Ewropa re berdewam dikin û wiha axivî: "Me bi rayedarên CPT re hevdînek kir. Wekî tê zanîn CPT ji roja hatiye avakirin heta niha bi rêk û pêk diçe Îmraliyê û rewşa Îmraliyê dişopîne. Komîteya P»şîgirtina li Îşkenceyê ye. Di heman demê de saziya Konseya Ewropayê ye û Tirkiye jî hebûna vê saziyê îmze kiriye. Erka CPT heye ku



rasterast biçe li girtîgehan lêkolîn û vekolînê bike. Erka wê heye ku raporan amade bike û bi raya giştî re parve bike. CPT herî dawî di îlona 2022'yan de li Îmraliyê hevdîtinek kir. Bi girtiyên din ên li Îmraliyê re jî hevdîtin kiribû. Lê rapora encama hevdîtinê hêj bi raya giştî re parve nekiriye. Heta niha wekî parêzer em ne xwedî agahî ne. CPT di çileya 2024'an de dîsa hat Tirkiyeyê û li gelek girtîgehan hevdîtin kirin. Lê vê carê bêyî ku biçin Îmraliyê ji Tirkiyeyê vegeriyan. Armanca vê hevdîtina me ya bi CPT re der barê van hevdîtinên CPT yên li Îmraliyê bû. CPT hêj rapor parve nekiriye. Ev li dijî peymana proseduran e. Diyar dikin ku hikûmet destûr nade ku vê raporê parve bikin û ji ber vê yekê raporê parve nakin. Diyar dikin ku rapor amade ye. Lê hikûmeta Tirkiyeyê destûrê nade ku aşkere bikin. Ev nîşan dide ku hikûmet ji encama raporê ne kêfxweş e."

**CPT hêzê dide Tirkiyeyê**

Prz. Erol anî ziman ku li gel vê helwesta hikûmetê ku ji bo hikûmetê ev 2 sal in raporê parve nake, dîsa di çileya 2024'an de hatin Tirkiyeyê û bêyî biçin Îmraliyê paşve vegeriyan û wiha axivî: "Me ev helwesta CPT ya neçûna Îmraliyê rexne kir. Me anî ziman ku ev helwest têr nake û dijberî vê yekê bêtir hêzê dide hikûmetê."

Prz. Erol li ser helwesta CPT jî rawestiya û wiha pêde çû. "Ew bi temamî li gorî burokrasiyê tev digerin. Ew dernakevin dervê sînorê peymanê. Dîsa naxwazin agahiyan jî bidin. Diyar kirin ku ew hesasiyeta me ya der barê Îmraliyê de fêm dikin û pozisyona Birêz Ocalan dizanin û ji bo raporê parve bikin di nava hewlanan de ne. Tenê van agahiyan didin. Wekî din agahî nadin. Mînak dema hatin Tirkiyeyê û neçûn Îmraliyê nikarin hincetekê nîşan bidin."

**CPT agahiyên zelal nade**

Prz. Ozgur Erol têkildarî dîroka demên pêş a CPT ku biçe Îmraliyê jî axivî û wiha got: "Dîrokeke şênber a serdanê parve nakin. Diyar dikin ku dê hewl bidin biçin Îmraliyê û dê şopandina girava Îmraliyê bidomînin. Diyar dikin ku hesasiyeta meseleyê dizanin. Me jî anî ziman ku rewşa Birêz Ocalan di nava gelê kurd de fikaran zêde dikin û xwest li gorî vê yekê gavan bavêjin."

Ozgur Erol der barê hevdîtinên pêş de jî agahî dan û wiha lê zêde kir: "Niha hevdîtinên cuda berdewam dikin. Ez niha tiştekî şênber nikarin bibêjim. Lê di çarçoveya bernameyekê de em ê hevdîtinan vê hefteyê temam bikin."

**Her kes rola Ocalan baş dizane**

Ozur Erol qedexe û astengkirina çalakiya rûniştinê ya li pêş CPT jî nirxand û wiha got: "Divê êdî her kes hesasiyeta gelê kurd a der barê rewşa Îmraliyê de rast û baş fêm bike. Divê her kes rol û rista pozisyona birêz Ocalan û wateya wî ya ji bo gelê kurd zanibin. Em ferq dikin ku ev saziyên Ewropa yên eleqeder li gorî vê rastiyê hesasiyeta ku tê xwestin, nîşan nadin. Di dîrokê de Mandela jî demek dirêj hat tecrîdkirin. Lê dawiyê heqê wî teslîmî wî kirin. Ji ber ku di çareseriya pirsgirêkek dîrokî de kesên ku karibin rola aştiyê bilîzin û wisa girtî bin, her tim heqê wan teslîmî wan dikin. Em îro dibînin ku Nobeta Edaletê ya li pêş Konseya Ewropayê didome. Em dibînin ku hesasiyeta mirovan a di vê mijarê de didome. Daxwazên van mirovan bi temamî rewa û zagonî ye. Bi astengkirina van daxwazan, ev pirsgirêk çareser nabe û bi dawî nabe. Tenê ji bo ser meseleyê bigirin û ji aliyê dewletan ve nayê dîtin van çalakiyan asteng dikin. Ev dibe sedem ku polîtîkayên tecrîdê li demê belavtir bibin. Tu aliyê vê yekê ku bê qebûlkirin tune ye."

Ozur Erol herî dawî anî ziman ku diçin kijan sazî rêxistinan û bi taybetî kurdên muxalif û polîtîk, dibînin ku bertek û nerazîbûn gel di asta herî jor de ye.

# Siwêd: Şam gavên çareseriyê navêje

Sosin Gulo

Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Evîn Siwêd li ser xebatên dîplomasiyê û astengiyên dewletan ên li dijî dîplomasiya kurdan axivî.

Evîn Siwêd bal kişand ser xebatên dîplomasiyê yên piştî Şoreş Rojava û wiha got: "Gelek xebat hene di rojavayê Kurdistanê de gelek nû ne. Ji bo bakur û rojhilatê Sûriyeyê ev xebat nû ne. Gelê vir berê rasterast ne di nava rêveberiya Sûriyeyê de bûn. Her tim tenê û li aliyekî hatibûn hiştin. Gelên herêmê û baweriyên herêmê di nava xwe de xwedî têkiliyên xurt bûn. Lê ji bo avakirinê û pêşeroja Sûriyeyê ev karên dîplomasî û siyasetê pir kêm bûn. Ji 19'ê Tîrmehê ango destpêka şoreşê heta ragihandina Rêveberiya Xweser tevgerek dîplomasiya hundirîn gelek pêş ket."

Siwêd da zanîn ku pêşengiya dîplomasiya kurdan jî partiya kurdan PYD'ê û di pêşengiya Kongra Star jinan kir û wiha axivî: "Di navbera partiyên siyasî, pêkhate û baweriyan de niqaş pêş ketin. Di destpêkê de Rêveberiya Xweser ya Kantona Cizîrê hat ragihandin. Şeklên xwerêvebirinê an jî guhertinên di nava Sûriyeyê de çêdibin bi pêşengtiya kurdan pêk hat. Li dijî navendîbûnê xwestin ku êdî hemû pêkhate bi reng û baweriyên xwe hebin. Piştî rizgarkirina Reqa, Minbic, Dêrazor û Tebqayê de ev niqaşên li ser şeklê rêvebirinê berfireh bûn. Naskirina gelên herêmî bi pêşentiya partiyên siyasî û rêxistinên jin careke din pêş ket. Di destpêkê de dîplomasiyek hundirîn hebû. Bi dîplomasiya hundirîn re hêdî hêdî dîplomasiya derve jî pêş ket."

Evîn Siwêd anî ziman ku ji roja Rêveberiya Xweser hatiye avakirin heta îro êrîşên li dijî Rêveberiya Xweser berdewam dikin û wiha lê zêde kir: "Li rojavayê Kurdistanê bi qasî xebatên dîplomasiyê nû ne jî li herêmê bi dehan kadroyên dîplomasiyê hene û li tevahiya cîhanê xebatan dimeşînin. Hem jî yên xwe wekî beşek Şoreşa Rojava dîtine, ji bo vê şoreşê kedê didin. Ev kes çi kurdistanî û çi kesên enternasyonal dibin û çi kesên alîgirên çareseriyê dibin hemû di nava xebata dîplomasiyê de cih digirin. Hem alîkariyê didin û hem kedê didin."

**Hemû pêkhate xebatê dimeşînin**

Evîn Siwêd destnîşan kir ku mirov nikare tenê wekî dîplomasiya kurdan pênase bike û wiha berdewam kir: "Di nava vê artêşa dîplomasiyê de kurd, ereb, suryan û pêkhateyên din hene. Hemû pêkhate û baweriyên din di nava şandeyan de cih digirin. Bi giştî dema ev dîplomasî tê meşandin hêzên derve astengiyan derdixin. Ji mijarên lojîstîk bigire heta mijarên pratîk heta mijarên ambargoyê derdikevin pêş. Hêzên li hemberî Rêveberiya Xweser dixebitin û dijminantiya karên Rêveberiya Xweser dikin hene. Yên ku naxwazin dengê gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê bigêje cîhanê hene. Daxwazin hebûna bakur û rojhilatê Sûriyeyê di nava diyalog, konferans, panel, semîner û kongreyên ji bo çareseriya Sûriyeyê pêk tên cih negire. Îro dewleta Sûriyeyê ji bo pêkhatiyên bakur û Rrojhilatê Sûriyeyê di nava dîplomasiyê de cih negire astengiyan derdixe. Dixwaze xwe bigîne hemû hêzên cîhanê û rê li pêş dîplomasiya bakur û rojhilatê Sûriyeyê bigire."

**Dîplomasiyê asteng dikin**

Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Evîn Siwêd, li ser astengiyên li pêş dîplomasiyê jî rawestiya û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Astengiyên li pêş dîplomasiya Rêveberiya Xweser her tim hene. Di salên borî de xebat di şertên gelek zahmet de pêş ket. Êrîşên li ser herêmê hiştiye ku dîplomasî zêde pêş nekeve. Karê dîplomasiyê kedek zêde û demek zêde dixwaze. Rêveberiya Xweser ji bo her tim gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê biparêze, her tim di qada dîplomasî û siyasî de kar kiriye û îro jî xebatên xwe berdewam dike. Hikûmeta Şamê ji bo çareseriya pirsgirêkan ne amade ye. Ji bo hikûmet pirsgirêkê çareser bike tu zext jî li ser wê tune. Li dijî vê helwesta Şamê deng û bertek jî pir qels in. Dengê di eniyekê de bibin yek qels in. Dengê aştîxwaz, demokrat û dengê ji kuştin, talankirin û înkarê re bêje êdî bes e, qels e. Dengê li dijî penaberî û qeyrana aborî lawaz e. Dengê kiryarên 12 salan ên li dijî mafê gelê herêmê bêje êdî bes e, lawaz e."






## 'Diz êdî ketine bêrîka me'

Abdullah Esen

Li Tirkiyeyê ji ber ku mazot, benzîn û buhayê dolar û euro li hemberî lîrayê tirk zêde dibe, qeyrana aborî kûr dibe. Buhabûna dowîz û mazotê bandorê li ser hemû alav û amûran dike. Ji ber vê yekê her ku diçe ked erzan dibe û saetên xebatê zêde dibe. Debara mirovan bêtir zor û zehmet dibe. Esnaf karker, kedkar û cotkar her roj li dijî vê buhabûnê bi gazinc in. Welatî û esnafên li navçeya Peyasa Amedê dijîn, ji ber ku kirîn û firotin zor bûye bi gilî û bertek in. Welatiyên ku diçin bazarê bêyî pêdiviyên xwe bistînin destvala vedigerin. Esnafên ku mal ji navendên hilberînê dikirin jî ji ber nikarin bifiroşin dikevin bin deynan. Beriya cejna Remezanê gelek welatiyan nikaribûn kêfa zarokên xwe bînin û pêdiviyên cejnê nekirîn. Kîloya şekirê cejnê par bi 100 lîreyî bû. Îsal 130-145 tl derbas kir. Kîloya goştê sor ji 200 tl yî derket 300-500 tl'yî

**Deynê esnafan zêde dibe**

Yek ji esnafê navçeya Peyasê Ensarî Yildirim anî ziman ku 5 sal berê rewşa aboriyê baş bû û wiha got: "Her roj rewşa aboriyê xerabtir dibe. Her roj buha dibe. Em êdî her tiştî bi deyn dikirin û em nikarin bifiroşin. Dema em difiroşin jî em zerar dikin. Ji ber vê yekê deynê me zêde dibe."

**'Êdî nema debara me dibe'**

Esnaf Abdûrrahîm Karadag jî diyar kir ku karê wan roj bi roj xerabtir dibe û wiha axivî: "Malê me 3 sal berê mal bi 5 lîreyî dikirî niha em bi 30 lîre dikirin. Ji ber ku her roj buhayê tiştan zêde dibe êdî em jî weke esnaf nikarin debara xwe ye malê bikin. Ev bandorê li ser muşteriyan jî dike. Em êdî nikarin debara malê bikin. Berê kesekî debara malbatekê dikir, lê niha 3-4 kes encax debara malbatekê bikin."

**'Muşterî matmayî dimînin'**

Karadag destnîşan kir ku zêdebûna buhayê, mazot, dolar û euro bandorê li ser buhabûna hemû alav, amûr û xwurekan dike û wiha lê zêde kir: "Her roj mazot buha dibe. Ev bandorek neyînî li esnafan dike. Em nikarin bo sefere weke berê wesayitan kirê bikin. Îro kîloya goştê mirîşkê 100 lîre ye. Qîmeta pere nemaye. Em esnaf jî ji mehê heta mehê goşt dibin malê. Muşterî çav li buhayê xwarinê dikevin matmayî dimînin. Diz êdî ketine bêrîka me û mala me. Heta ku di malê de be tu carî aboriya rast nabe."

**Esnaf zerar dikin**

Abdûlmecîd Karadagli jî destnîşan kir ku pergal li ser navê olê gel dixapîne û wiha got: "Desthilat her roj faîzê zêde dike. Mûçeyên xwe û kesên derdora xwe zêde dikin. 6 sal berê lîtreya mazotê bi 5 lîreyî bû. Niha 45 lîre derbas kir. Niha kîloya îsotê 60-70 lîre ye. Em 5 lîre heqê keda xwe lê zêde dikin, lê em dîsa nikarin debarê bikin. Em zerar dikin û kar nakin."

## HEVPEYMANA JINAN DÊ BIBE MÎNAKA CÎHANÊ

# Dixwazin hevjiyana azad ava bikin

■ Medya Bal

*Li bakur û rojhilatê Sûriyeyê di 12'ê kanûna 2023'yan de bi tevlêbûna hemû pêkhateyan û 158 delegeyan Hevpeymana Civakî hat îmzekirin. Bi vê hevpeymanê, dê hemû pêkhateyên netew û baweriyan xwedî heman maf bin. Hevpeymana Civakî di asta bakur û rojhilatê Sûriyeyê de hat îmzekirin. Piştî vê peymanê niha tevgera jin dixwaze Hevpeymana Jinan îmze bikin. Jin li bakur û rojhilatê Sûriyeyê amadekariya vê peymanê dikin. Têkildarî mijarê endama Koordînasyona Meclisa Jin a Bakur u Rojhilatê Sûriyeyê Jiyan Huseyîn ji rojnameya me Xwebûnê re axivî. Hevpeyvîna bi Jiyan Huseyîn re wiha ye:*



Jiyan Huseyîn diyar kir ku hemû zagon bi destê mêran hatiye nivîsîn û wiha got: "Jinan ji nedîtî ve hatine. Me jî pêwîst pê dît ku peymaneke jinan amade bikin. Amadekariya nivîsandina hevpeymanê dikin."

***Demek berê we li bakur û rojhilatê Sûriyeyê Hevpeymana Civakî xist meriyetê. Armanca vê hevpeymanê çi bû û çawa hat amadekirin?***

Weke tê zanîn 12 sal berê li rojavayê Kurdistanê Şoreşa Rojava pêk hat. Ji destpêkê heta îro gelek êrîşên qirkirinê li ser bakur û rojhilatê Sûriyeyê pêk hatin. Lê em bibêjin li rojavayê Kurdistanê dema ku şoreşa wê dest pê kir a ku hîşt ev tiştê bû şoreş du nimûneyên wê hebûn. Yek jê dema ku xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û rojavayê Kurdistanê xeta xwe ya sêyemîn girtin. Gotin 'em ê bixwe bixwe pergala xwe bi rê ve bibin û pergala xwe ava bikin.' Ya din jî û ya herî girîng jî ew bû ku Şoreşa Rojava wek Şoreşa Jinan hat nasîn. Ji ber ku jinên li rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi hemû pêkhateyên xwe raste rast ne tenê di qadekî de di hemû qadên siyasî, dîplomasî, leşkerî, cîvakî û rêxistinî de pêşengtiya vê şoreşê kirin. Bandora ku jinên kurd li jinên suryan, ereb, ermen, çerkes û çeçenan kir, rê li ber wan vekir ku ew jî xwe tev li şoreşa ku pêk hatiye bikin.

Dema ku em dibêjin bakur û rojhilatê Sûriyeyê pergala xwe ava kir di rastiyê de em dibînin ku ev pergal rêvebirina gel a xwebixwe ye. Ji bo gel karibe bixwe biryarên xwe bigire pêwistî bi hin pîvanan heye. Ji bo vê yekê jî divê ji rastiya gel sûd bê wergirtin û li gor esasên cîvakê zagon bên amadekirin. Ji bo vê yekê jî beriya niha bi xebateke berfireh Hevpeymana Civakî hat amadekirin.

Ji bo gelê ku li herêmên hatine rizgarkirin û herêmên ku di bin dagirkeriya çeteyan de bûn divê xebatek bihata meşandin. Di du salên dawî de ji bo hevpeymaneke civakî were amadekirin komîteyek hat avakirin. Ev komîteya ku ji bo civaka bakur û rojhilatê Sûriyeyê hat avakirin ji 158 kesan pêk dihat. Di komîteyê de jin û mêran bi heman awayî cih girt û hejmara wan jî yek bû. Ji nav vê komîteya ku ji 158 kesan pêk dihat komîteyek biçûktir hat avakirin ku ew jî 75 kes bûn û dîsa bi heman awayî hejmara jin û mêran yek bû. Van komîteyan di nav gel de geriyan fikra Hevpeymana Civakî ji gel re vegotin û nêrînên wan girtin. Her wiha ev komîte di nav saziyên civakî de jî geriyan û sûd ji tecrûbeyên wan girtin. Di encama van xebatan de Hevpeymana Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 12'ê kanûna 2023'yan de ji aliyê Meclisa Gel ve hat erêkirin û ket meriyetê.

***Hevpeymana Civakî bandoreke çawa li ser civakê kir? Her wiha cudahiya vê hevpeymanê ji qanûn ku pergala dewletê derdixe, çi ye?***

Tişta herî balkêş di vê hevpeymana cîvakî ya giştî de bakur û rojhilatê Sûriyeyê de ew bû ku dema tu pergala xwe ava dikî û tu pêş gotina xwe, hedef û armancên te çine vedibêjî. Tu tê bi prensîbên xwe yên sereke kar û xebatên xwe dimeşînî. Her deste bi hevpariya desteyên din ji bo civakê kar û xebatên xwe dimeşîne. Bi vê hevbeşiyê re wek xelek em hem karên xwe hem civaka xwe pêşdixin. Jixwe di vê hevpeymanê de der barê mijarên aborî, zanistî, perwerdehî û xweparastinê de gelek xalên bingehîn hatine nivîsîn. Em niha li bakur û rojhilatê Sûriyeyê amadekariyên hilbijartinên şaredariyan dikin. Wek tê zanîn em xebatên şaredariyan ji ber têkiliyên wan ên bi gel re pir pîroz dibînin. Ji ber pîrozbûna vî karê herkes xwe li gor pîvanên ku di Hevpeyman Civakî de hatine diyarkirin tev li kar dikin.

Wek hemû pêkhateyên civakê jin jî di nav hemû qadan de di her astê de xwe tev li xebatan dikin. Wek tê zanîn pergala hevserokatiyê ji bo me pergaleke jêneveger e. Ji ber vê yekê ye ku her kesên ku xwe tev li kar dike bi hişmendiya pêşxistina pergala hevserokatî ku cara yekemîn ji aliyê kurdan ve hat pêşxistin, xebatên xwe dimeşîne.

Rastî dema ku ev hevpeyman hete nivîsandin bandorek erênî li ser gel kir. Me dît ku çawa gel nêrînên xwe parve dike û hin xalên ku komîteya ku hatiye avakirin nefikirînbû pêşniyar kirin. Ji bo wê jî razîbûna gel a hevpeymanê gelek bandor kir û gel digot 'ji bo me gelek baş e.' Da ku em dikaribin xwe bi rê ve bibin û pergala xwe ava bikin. Hewceye ku em bi awayekî kolektîv û xebatên komînal li pêş bixin. Ji ber vê yekê jî ev tiştê bandorek pir xweş li ser cîvakê kir. Civak heta îro dibêje ev tiştê gaveke serkeftî. Di dawiya 2023'yan ev hevpeyman hat amadekirin. Di sala 2024'an de jî dê bikeve meriyete. Ji ber ku ji qanûn dewletê cudatir bi gel re ev peyman hatiye nivîsîn gel bi kelecan li bendê ye ku bikeve meriyete.

***Piştî Hevpeymana Civakî niha we dest bi amadekirina Hevpeyman Jinan kiriye. Fikra hevpeymana jinan çawa derket pêş?***

Piştî Hevpeyma Civakî hat nivîsandin ji xwe beşên jin jî di hindurê wê de hebûn. Ji ber ku meclisa jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di pergala cîvakî ya jin de cihê xwe girt. Lê me di wir de jî pêdiviyên mezin pê dît ku hevpeymanek jin jî bê nivîsandin. Ji ber ku heta roja îro li cîhanê kesî hevpeymana jinan nenivîsandiye. Ji ber vê yekê her tim çi derketibe bi destê mêran hatiye nivîsandin. Niha çi zagon hebin dîsa bi destê mêran tê nivîsandin. Lê vê carê jî di hundirê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de rastî Meclisa Edaleta Jin heye, Meclisa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê heye, Kongreya Star heye, Kombûna Jinên Zenûbiyan heye û gelek rêxistinên jin hene. Bi taybet jî li vir hat naskirin. Di sala 2014'an de zagona jin derket. Ew zagon çiqasî bandora xwe li maf, parastin, hiqûq û erka jinan kir me dît. Piştre me navê vê zagonê guhert. Ji ber ku bi tenê jin jê bandor nabin. Me got 'mêr jî jê bandor dibin' ji ber ku em dixwazin hevjiyana azad ava bikin. Ji aliyê din ve bandora wê li zarokan jî hebû. Ji ber vê yekê me navê wê di 2020'an de guhert û kir Zagona Malbatê.

Di guhertina nav de me hinek xalên sereke jî ji bo jinan lê zêde kir. Ev zagon li hemû deverên bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji bo jinan hatin pejirandin û erênî hat dîtin. Niha ev zagon li hemû hereman ketiye meriyete. Pêkanîna vê zagonê li herêma Cizîre ketiye pratîkê jî lê li hin heremên din di pêkanîna vê zagonê de em zehmetiyan dikşînin. Lê gav bi gav em ê hemû zagonên jinan li hemû herêman bikin mertiyetê.

***Wek tê zanîn ji B.Z'ê ku Qanûnên Hammûrabî hatin amadekirin heta niha hemû qanûn bi destê mêran tên amadekirin. Hûnê Peymana Jinan a ku amade dikin li ser kîjan esasî amade bikin?***

Wek ku me got ji ber ku hemû zagon bi destê mêran hatiye nivîsîn û jinan ji nedîtî ve dîtine me pêwist dît ku peymaneke jinan amade dikin. Ji bo wê jî niha em amadekariyan dikin ku em ê çawa hevpeymana jinan binivîsin. Lê wê çawa bê nivîsandin? Di destpêkê de weke pêşgotinek divê hebe. Piştî wê weke prensîbên sereke yê jinan dê bên diyarkirin. Piştre xalên aborî, çandî, rêxistinî, dîplomasî û leşkerî ên ji bo jinan dê pêş bên xistin. Ji bo wê jî niha amadekariyên me tên kirin. Niha em hewl didin ku em komîteyekê amade bikin ji bo reşnivîsek û hevpeymana jinan amade bikin. Dema ku ew komîte hat hilbijartin û dest bi nivîsê kir em ê ji bo ku hevpeymanek ji bo xizmeta jinan amade bikin, dest bi girtina nêrînên jinan û saziyan bikin.

***Hevpeymana Jinan dê bandoreke çawa li ser civakê bike?***

Rastî dema ku ev hevpeymana jinan bê nivîsandin û bikeve pratîka xwe de dê bandora xwe hebe. Ji ber ku niha em dibînin çavê her kesî û hemû rêxistinên tevgerên çi di asta Sûriyeyê de û yên ku çi asta Rojhilata Navîn de bin û yên ku çi asta cîhanê de bin çavên wan hemû li Şoreşa Rojava ye. Şoreşa jinê ku her tim gihertin û veguhertin heye ku em bivêjin şoreşa me bandora wê heye. Heta roja îro em di nav têkiliyan, rêxistinan û têkoşîna tevgerên jin de ne. Dema bandoran van hevpeymanan bê kirin dê bandorek mezin li têkoşîna hemû jinan bike. Dê ev tişt di asta navneteweyî de jî bê kirin. Ji bo wê jî dema ku em binivîsin divê em hesabê herkesî bikin. Ku çawa ew jî ji vê hevpeymanê sûd werbigirin. Da ku êdî ew jî dikaribin li cem xwe hevpeymanên xwe binivîsin û têxin meriyetê.

***Bi vê peymanê hûn dixwazin bandoreke çawa li Rojhilata Navîn û cihanê bikin?***

Em amadekariyên gelek kar û xebatan dikin. Lê divê em ji bîr nekin ku heta îro jî gelek êrîş, zext û zorî li ser herêmên me hene. Bi taybet jî li ser jinan hedef têne kirin. Di hundirê bakur û rojhilatê Sûriyeyê de em dibînin ku her roj êrîş bi rêya balafiran li dijî jinan tên kirin. Her tim êrîşî herêmên me dikin. Ne tenê bi rêya balefiran dewleta Tirkiyeyê dagirker û çeteyên pê ve girêdayî êrîşî me dikin. Di heman demê ji aliyê rejîma Sûriyeyê, Îran û DAIŞ'ê ve jî êrîş li ser me tên kirin. Lê tevî ku ew qas êrîş û zextan li ser me dikin jî dîsa gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê li ber xwe dide. Bi taybet jî em bibêjin gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi hev girtin û yekîtiya xwe li dijî van êrîşan disekinin û dikarin di demekê de gelek gihertin jî bi xwe re bide avakirin. Ji ber ku pêdiviya me her tem bi gihertin û veguhertinan heye ku em çêbikin. Ji ber ku her tim rewşa herêmê tê gihertin. Di her guhertinê de hinek pêkhateyên din tev li rêveberiya xweser dibin. Ji bo wê em vî tiştê pir baş dibînin. Ew qas êrîş û qirkirin li ser me tên kirin di heman demê de jî hîn bêhtir em dikarin pergala xwe xurttir û berfirehtir bikin. Em dikarin hinek guhertin û veguhertinan çêbikin. Da ku bandorek mezin li derdora xwe jî bikin. Ji bo wê jî em vê gavê jî serkeftî dibînin.



### Jiyan Huseyîn kî ye?

Di sala 1989'an de ji dayik bûye. Ji Serêkaniyê ye. Ji 2015'an de di nava kar û xebatên rêveberiyê de cih girt. Di serî de di Komîteya Kedkaran de 2 salan xebitî. Di nava xebatên Kongra Star de cih girt. Nêzî salekê Berdevkiya Kongra Star a Hesekê kir. Piştre bû endama Meclisa Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Niha endama Kordînasyona Meclisa Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye.

# Pirsa Socrates: Nefspiçûkî yan nîhîlîzm

“Tişta ku ez dizanim tenê ew e ku ez bi tiştekî nizanim”. Ev e peyva ku li ser wî herî zêde tê zanîn. Tiştek nenivîsî û li pey xwe nehişt, lê şargirtên wî Platon û Xenophone gelek tişt li ser nivîsandine û belav kirine



Îbrahîm Seydo Aydogan

Agahiyên li ser Socrates ji Apolojiya Socrates bigirin heta bi berhemên dawîn jî bêtir ji şagirtekî wî tê ku navê wî Platon bû. Platon an jî Eflatûn, weke ku Ehmedê Xanî jî navê wî di Mem û Zînê de aniye ziman, dibe referansa sereke ya li ser Socrates. Ji bilî Platon, şagirtekî din jî gellekî li ser wî nivîsiye ku ew jî Xenophone e ku hem weke siyasetmedar, weke dîroknas û hem jî leşkerekî tê naskirin. Di nava Kurdan de, weke ku Celadet Bedirxan behsa wî dike, di Anabasîs de behsa şerrê li dijî Kardûkan dike.

Cudahiya her du çavkaniyan herweha bûye sedem ku îmajên cuda li ser Socrates ava bibin.

Sedsala 5’an berî Îsa ye. Yewnana antîk ji sedsala 6’an ve bûye cîhê ramyarên mezin û hatiye, kesên weke Herodot, Parmenîd, Pîsagor, Hîpokrît û Protagoras Abder hema hema ji dewra Socrates in.

Tişta balkêş li ser Socrates ew e ku ji bilî felsefeyê tu karên din nekirine; lê belê tê gotin ku weke pêhlewan tev li çend şerran bûye û mêrxasekî nedîtî bûye ku ev agahî kêm tên zanîn.

Platon û Xenophones li ser li hev dikin ku Socrates ne bi bejn û bala xwe ve xweşik bû, lê belê gellek heyranên wî hebûn. Ji bo zilaman, cesaret û zanabûn, ji xweşikbûna fizîkî bêtir balê dikişînin. Platon dibêje ku xizan bû, lê Xenophones dibêje ku ne xizan bû û qîma xwe bi tiştên weha ve nedianî. Lê, tê zanîn ku ciwanan gellekî dida ser rêya wî, bi taybetû ciwanên dewlemend û wî jî ji xortikên ciwan hez dikir, weke ku adet bû li civaka wê demê. Ji ber wê ye ku hin kes wî weke bîseksuel jî didin nasandin, lê ev agahî zêde nakeve serê mirov; ji xwe sinifandinên bi vî rengî ji derveyî xwezaya mirov in, bi taybetî di dewreke weha de ku homoseksuelî nîşana arîstokrasiyê bû.

Ji ber ku wî bi xwe tiştekî nivîskî nehiştiye, hemû agahî jî li ser devê duyem hatine heta îroj û hema kî rabûye nirxandinek zêdetir li ser wî kiriye. Ji Platon û Xenophone û Arîstot bigire heta bi Hegel û Bergson û Nietzche, û hetta bi Lacan ve jî, Socrates bûye cîhê miraqê ji bo ramyaran. Axir, herkes li ser hemfikir e: Socrates trajedî bi xwe ye. Neheqî lê bûye. Lê trajediya wî ne bi tenê ji neheqiya dadgehê tê. Jiyan bi xwe neheqî ye, weke ku Nietzche li ser wî dibêje. Li ser hebûna ku tahammula wî jê re nedibû, nîhîlîzmek pê re peyda bûbû, lê herçend li hember raqîbên xwe bêrehm bûya jî, cîh ji qurretiya vala re jî nebû li cem wî. Lewre nirx û rûmet, an jî giranî, bi hebûnekê çêdibe. Ji ber wê ye ku di dadgeha dawîn de bangî Meletos dike û henekên xwe bi helbestên wî dike, digel ku Socrates li ser giliyê Meletos û Anîtos û Lîcon dihat darizandin û axir ew ê bi mirinê ve bihataya cezakirin.

Di vê mijara Socrates de, weke ku Dorion yê pisporê mijara Socrates jî balê dikişîne ser, nakokî hene. Bi kurtî, hin xalên hevpar yên bingehîn hene ku divê li ser Socrates werin zanîn: naskirina xwe, pirsiyariya li ser jiyanê, rêbaza pirsan, pirsa li ser zanînê.

Bêguman, Dorion jî di lêkolînên xwe yên li ser Socrates de pişta xwe ji neçarî dispêre Platon û Xenophone û yên piştî wan.

Ya rast, ev mijar bi awayekî îronîk pirsa me ya bingehîn derdixin holê: nefpiçûkî an jî tewazû û bi zimanên ewropî modestî.

Cahilên zana yên dema me ku tenê sernivîsan dixwînin, ji bo peyva “ez bi tiştekî nizanim” nirxandinên lezgîn dikin ku dûrî kûrahiyê ne. Socrates nefspiçûk nebû. Lewma digel ku dizane ku dikare bibe sedema mirina wî jî, napejirîne ku qaziyên dadgeha bilind wî kêm bikin.

Gava ku dadgeh dide zanîn ku biryareke teqez li ser cezayê mirinê çênebûye û li gorî qanûnê hingê mafê Socrates heye ku ew bi xwe cezayê xwe hilbijêre, Socrates dibêje ku ev kiryara dadgehê neheqî ye li hember şexsê wî. Xwe kêm nake.

Hevalên wî derfetê peyda dikin ku wî ji girtîgehê birevînin jî, Socrates careke din red dike. Xwe kêm nake.

Gava ku wê jahrê di îskanekê de didin destê wî, ew bi xwe jahrê vedixwe. Xwe kêm nake.

Nahêle ku kes li ber wî bipeyive. Tew gava ku cahil bin, wan dide ber pirsan da ku ew bi xwe li bersivan bigerrin. Lê weke ku ew bi xwe dibêje “Ez ne mamosteyê tu kesî me”. Rikberên xwe kêm û piçûk dike, weke ku tîne serê dadweran û Metelos. Lewma Nietzche wî weke nîhîlîstê yekem bi nav dike.

Hingê ka nefspiçûkî?

Mêrik bavê qurretiyê bû, ku Nietzche ev yek weke encama aciziyê nirxandiye û ew gîhandiye nîhîlîzmê.

Madem Socrates ewçend ji xwe bawer e, gelo çima xwe li nezaniyê daniye?

Gelek kes îroniyê di vê helwêsta wî de dibînin. Lê, bi ya min, ne tenê îronî ye. Weke ku xaleke din ya hevpar e li ser wî, maqûlî û kamilî ye. Socrates zanîbû.

Zanîbû ku zanîn bêdawî ye, lewma gihîştibû wê zanînê ku ew çiqasî fêr bibe û bizane jî, tenê dikare beşekî piçûk bizane û nikare xwe bigihîne hemû zanyariyan û temenê mirov têrê nake ku bi hertiştî bizane. Lewma, rast digot: bi tiştekî nizanîbû. Belkî nehêlana çavkaniyên nivîskî ji ber wê bû. Wî zanîbû ku hemû zanyariyên ku ew ê bihêle dikarin sibê bi zanyariyên nû ve werin guhertin. Ji ber wê ye ku Socrates tenê tiştek li pey xwe hişt: metod, yanî rêbaz; rêbaza zanyariyê. Bala xwe bidin tawanên ku li dadgehê li wî dikirin: ciwanan bi pirsan ji rêyê derdixe, îtîbarê bi Xwedayên me nayne, Xwedayên nû tîne sîteyê.

Socrates dibêje “min tiştek ji ciwanan re negotiye; tenê, min fêrî wan kir ku pirsan bikin”.

Ma mêrik bi hezaran pirtûk bihiştana gelo dê ji van helwêstan xurttir bûya qey?

Rast digot. Wî Xwedayên nû neanîbûn, tenê pirs li ser Xwedayên heyî xistibûn serê ciwanan.

Digel ku Thales weke yekem filozofê mezin tê binavkirin jî, herkes Socrates weke bavê felsefeyê dinirxîne, lewre ew e yê ku li ser xwebûn, hebûn û Xweda û rûmet û zanînê helwêsta pêşîn bi awayekî metodîk daniye û bingehê epîstemolojiyê nîşan daye ku arîstokrasiya yûnanî jê hez nedikir.

Nezanîna îronîk jî ne îronîk e. Camêr çiqas zane be jî, ya rast, nezan bû, û wî hay ji vê hebû. Çiqasî serê xwe diêşand jî li xwe hay dibû ku hê gellekî nezan e; lewma digot “heger tiştek hebe ku pê dizanim, ew jî ew e ku ez bi tiştekî nizanim”. Ne nefspiçûkî ye, qurretî ye; lê herweha maqûlî û kamilî ye jî.

***Çavkaniyên sereke li ser mijarê:***

✓ ***Platon:*** hemû diyalogên Platon, ji bilî Qanûn, behsa Socrates dikin, mîna Apolojiya Socrates, Banquet û Komar û hwd.

✓ ***Xenophone:*** Apolojiya Socrates, Memorables


✓ Louis-André Dorion, Socrate, Paris, Presses universitaires de France, coll. « Que sais-je ? », 2004

✓ ***Gregory Vlastos, Socrate :*** Ironie et philosophie morale (ji ingilizî wergeriyaye fransî “Socrates, Ironist and moral philosopher”) Paris, Aubier, coll. 1994, 455 p.


✓ Jean Humbert, Socrate et les petits socratiques, Paris, PUF, 1967

✓ Claude Mossé,- 399. Le Procès de Socrate, Bruxelles, Complexe, 1987, 153 p.

✓ Friedrich Nietzsche, Crépuscule des idoles (1888)



# Ziman û hilberîn



Adar Jiyan

Mirov ji bo ku bijî, xwe biparêze û debara xwe bike pêşî bi xwezayê re têkiliyê datîne. Di vê têkiliyê de pêrgî gelek tiştên ku nas dike û nas nake belê pêdiviya wî/wê pê heye dibe. Ji bo ku ji wan tiştan sûdê wergire; hem wan bi kar tîne û hem jî tiştekî li wan zêde dike. Ew zêdekirin jî hilberîneke domdar û misêwa bi xwe re tîne. Ji bo wê, meriv dikare mirov wekî heyinekî biaqil, hilberîner û civakî pênase bike. Lewre hişmendiya mirov, hilberîneriya wî/wê, hilberîneriya wî/wê jî civakîbûna wî/wê derdixe holê.

Mirov tiştên ku dibîne tenê bi bi nav nake; heman demê tiştên ku difikire, disêwirîne û xeyal dike jî bi nav dike. Ziman, bi jiyana civakî, ezmûn û zanîna kesên din re pêk tê û pêşve diçe. Pêketina zimanê civakekê rasterê girêdayî hilberîn(eriy)a wê ye. Hewce ye ku mirov li gel gerdûna şênber, gerdûna ku di hişê xwe de diafirîne jî pênase bike. Mirova/ê ku hatiye afirandin, bi saya hilberînê dibe heyîneke/î afirîner.

Hilberîn, têkiliya navbera mirov û xwezayê ya sereke ye. Zimanê mirov ê herî kartêker bi saya hilberînê pêk tê. Hest û hizrên mirov û herwiha yekeya fikr û boçûnên mirov ên herî giring, pêşî bi hilberînê dest pê dikin. Destpêka hilberînê destpêka afirandina ziman e jî. Her hilberînek bi xwe re zimanekî nû pêk tîne. Li gel awa û çawaniya ziman; bikaranîn, geşedanî û tekûzkirina ziman jî rasterast bi şêwaza hilberînê û alavên wê ve girêdayî ye. Sazûmana sereke ya ku mirov li gel çand, huner û wêjeyê wî/wê ber bi civakîbûnê ve dike, zimanê wî/wê yê hilberînê ye.

Ziman li gor dem û serdema ku mirov tê de dijî û herwiha li gor awa û şêwaza hilberînê û alavên wê pêk tê, dişêwe û pêşve diçe. Mirov an jî civaka ku tiştekî hildiberîne, pêşî bi zimanê xwe nav lê dike. Peyre ew navê resen û sereke li tevahiya dinyayê belav dibe û wekî navekî/peyveke hevpar mayînde dibe û dibe aidê hemû civakan. Gelek zimanên ku di serdema navîn de dewlemend bûn, îro bi serdema teknolojî û zanînê re mehiyane û hin bi hin jî holê radibin. Pêşî hilberîna civakên serdema çandiniyê li ser axa welatê wan pêk dihat û alavên hilberînê yên ku çêdikirin jî bi zimanê wan dihatin binavkirin. Mînaka herî berbiçav ew e ku; civakên ku cara pêşîn li ser xaka Mezopotamyayê çandinî pêk anine û alavên hilberînê çêkirine, bav û kalên kurdan bûne. Pêşî wan cot û alvên çandiniyê çêkirine û bi vî awayî debara xwe kirine. Ji ber ku alava sereke a hilberîna wê serdemê a bingehîn ‘halet’ bûye, ew nav wekî ‘alet’ê li her derê cîhanê belav bûye û mayînde bûye. Navê gelek alavên ku hê jî tên bikaranîn. bi vî awayî belav bûne. Hilberîna dîroka nêzîk jî vê yekê diselmîne ku kîjan civak çiqas hilberîner be ewqas zengîn dibe û çiqas zengîn dibe jî zimanê wê ewqas xurt û dewlemend dibe. Wekî nimûne; kesê ku radyo dahênandiye bi zimanê xwe nav lê kiriye û navê radyo li hemû deverên cîhanê wekî ‘radyo’ hatiye bilêvkirin û belavkirin. Herwiha, telgraf, telefon, televizyon, trên, otabus, motor, apartman, salon, balkon, tiyatro, sînema, înternet, facebook, whatsApp û hwd. bi heman awayî ji hêla kîjan kes an civakê ve hatibe dahênandin ew nav li hemû welatên cîhanê bi wî awayî tê belavkirin û bikaranîn.

Ji ber ku mirov di heman cihanê de, li heman erdnigariyê an li heman welatî bi hev re dijîn, di nav têkiliyeke jêneger de ne. Bi têkilî û danûstandina wan re hevhikariya zimanê wan jî rû dide û wekî diyardeyeke xwezayî derdikeve holê. Ango, dema ku civakek bi civakekeke din re rasterast an jî nerasterast têkiliyê datîne, di navbera zimanê wan de jî têkiliyek çarenîn pêk tê. Ew ziman ji hevdû bandorê werdigirin, peyvan didin û distînin; gotinên pêşiyan, peyv û biwêjşn wan û dikevin nav hev.

Ji aliyê din ve jî, li gelek welatên cîhanê hêzên emperyal û mêtinger bi dagirkirina welatên mêtingeh re zimanan jî dagir dikin û hêdî hêdî tune dikin. Civaka dagirker/mêtinger, çendî ku zimanê gel qedexe bike û zimanê xwe li ser wê civakê bide ferzkrin jî, ji ber ku têgih, peyv û navê alavên hilberînê bi zimanê civaka xwecih pêk tê, civaka sedest bêtir di bin bandora zimanê civaka bindest de dimîne û gelek peyvan ji wi zimanî werdigire. Heke zimanê civaka serdest ji zimanê civaka bindest dewlemendtir be, zimanê civaka bindest dimehe û hin bi hin li zimanê civaka serdest dadigere. Na heke zimanê civaka bindest dewlemendtir be, zimanê civaka sedest dibin bandora zimanê civaka bindest de dimîne.

Di hevhikariya navbera zimanan de têkilî û veguhertina peyvan de, tê dîtin ku hevbandorkirina zimanan ji tiştekî asayî ye. Çi kevin çi ji nû dibe, hemû ziman bandorê li hevdû dikin û bi heman awayî di bin hevhikariyeke hev a domdar de diminin. Ev rastiyeke civakî ye ku di encama pêşxistina têkiliyên curbecur ên di navbera civakên cihê de; têkiliyên cîrantiya gelan û pêkhateyên nijadî, olî û neteweyî bêtir di xwe ziman de didin der.. Dema ku em bi awayekî giştî li ser zimanên têkildar hûr bibin , em ê bibînin ku di navbera wan de ji gelek guhastin, vegugahastin û guherandinên cuda pêk hatine. Hemû zimanên cihanê hem peyvan bi deyn didin zimanên din û hem jî ji zimanên din peyvan deyn dikin. Peyvên bideyn wergerên semantîkî ne ku peyv bi peyv ji zimanekî ji bo zimanekî din têne çêkirin, bi navgîniya deynên hundirîn ên di nav zimanekî de, di navbera mirov, komên civakî û zimanên pîşeyî de têne veguhastin. Peyvên hîbrîd/ bîjî, di navbera zimanan de bi avahiyên dengî û semantîkî ên cihêreng in ku li hin peyvên nû dadigerin

Di fêrbûna zimanên biyanî de rewşek pir gelemperî ya ji ber têkilî û bandora zimanên bidestxistî li ser zimanên sêyem an jî bandora zimanê ku tê hînkirin li ser zimanên ku berê hatiye hînkirin, heye. Derbasbûna peyvan a di warê wêjeyê de wekî veguhastinê tê binavkirin. Têkiliya di navbera veguhastin û bilêvkirinê de, ji ber ku ferqa devkî ya yek zimanî di danûstendina navzimanî de jî bandorê li bilêvkirinê dike û fêrbûna zimanê duyemîn û têkiliya navbera veguhastin û bilêvkirinê de pir tevlihevî derdikeve. Lewre tiştê ku mirov pêşî nav lê dike, êdî dibe tiştekî nû. Jixwe navlêkirina yekem jî bi vî awayî derdikeve holê. Çareserkirina pirsgirêka zimanî ya ku li cîhana derve û ya di di hişê mirov de pêk tê, çiqasî têkildarî hev in an jî çi qasî li hev dikin, ew jî dîsa girêdayî têkiliya navbera zimanan e.

Gencîneya herî mezin û asêgeha herî tebût a ku serpêhatiyên dîrokî, çandî, hunerî û wêjeyî di xwe de dihewîne û nirx û hêjahiyên gelêrî, civakî û neteweyî diparêze zimanê hilberînê ye. Ji bo wê; divê zimanê hilberînê tenê wekî amûreke ragihandinê û navgîna pêwendî û danûstandina rojane neyê dîtin. Heçku, her ku hilberîn zêde dibe, peyvên nû tevlî ziman dibin û gencîneya ziman jî dewlemendtir dibe.

# Statûya herêma Başûr di xetereyê de ye

Piştî 30 salan cara yekem ku rewşa statûya li Başûr ewqas dikeve xetereyê. PDK, bi taybet malbata Barzanî weke qeyûman dest danîne ser destkeftiyên kurd ên ku bi berdêlên giran hatine girtin

Amed Dicle



Statûya herêma başûrê Kurdistanê cara yekem e ku ewqas di xetereyê de ye. Ji aloziya niha re çareseriyek neyê dîtin. Di nava çend mehan de herêma Başûr dikarê bê parlamento û hikûmet were hiştin. Başe sedem çi ye? Rewş çima wiha bû? Û çi senaryo têne nîqaşkirin?

Weke ku xwendevanên me dizanin li herêma Başûrê Kurdistanê ji çar salan carekê hilbijartinên parlamentoyê pêk tên. Piştî parlamento hat hilbijartin hikûmet tê avakirin û serokê Herêmê tê destnîşankirin. Herî dawî di 30'yê îlona 2018'an hilbijartin pêk hatin. Diviyabû îlona 2022'yan hilbijartin çêbibin lê nebûn. Li gorî zagona federal a Iraqê hikûmeta herêmê ku niha Mesrûr Barzanî jêre serokatiyê dike betal e. Piştî nîqaş û gengeşiyan hat diyarkirin ku dê di 10'ê hezîranê hilbijartin pêk werin. Desteya Bilind a Hilbijartinê ya Iraqê ev biryar ragihand. Her wiha heman saziyê desteya hilbijartinê ya herêmê betal kir. Yanê; li herêma Kurdistanê êdî desteyek hilbijartinê nîne. Eger hilbijartin çêbibe ew ê pêvajo ji aliyê desteya hilbijartinê ya federal ku navenda wê li Bexdayê ye bê meşandin. Ev tişt cara yekem e pêk tê.

Piştî ku dîroka hilbijartinê hat eşkerekirin Dadgeha Bilind a Iraqê du biryarên girîng dan. Biryara yekê kota hatin betalkirin. Weke tê zanîn parlamentoya herêmê ji 111 kursiyan pêk dihat. 5 ji bo tirkmenan, 5 bi xristiyanan û 1 jî ji bo ermenan bi giştî 11 kota hebûn. Niha ev çûn û 100 kursî man. Ev 11 kota di lîsteya PDK'ê de dihatin bi cihkirin û dema hilbijartinê PDK bi 11 kursiyan li pêşiya partiyên din dest pê dikir. Ango; PDK bi 11, partiyên din bi sifirê dest pê dikirin. Ev biryar ji bo PDK'ê derbeyek mezin bû. Biryara duyem a dadgehê; 400 hezar dengên ku di hilbijartinên borî de hatine dayin bêxwedî ne. Tê gotin ku 400 hezar kurdên Rojava, Rojhilat û Bakur ên li herêmê ne, PDK'ê ji wan re nasname derxistiye û deng dane. Niha Bexda dibeje ku ev 400 hezar kes nikarin deng bi kar bînin. PDK vî tiştî jî qebûl nake.

Çima? PDK di hilbijartina borî de 45 kursî bi dest xist. 11 kota bûn 34 jî qezenc kirin. Lê PDK'ê bi giştî 680 hezar deng bi dest xist. Eger ji vana 400 hezar deng bi kar neynin dimîne 280 hezar. PDK bi 280 hezar dengî encax 12-15 kursiyan qezenc dike. Û li gorî vê rewşê dibe partiya sêyem û desthilatdariya xwe winda dike. Ji ber vê yekê PDK naxwaze hilbijartin çêbibin û çêbibe jî naxwaze beşdar bibe.

Di rewşa heyî de PDK bixwaze jî êdî nikare beşdar bibe. Ji ber ku lîsteyên partiyên beşdar dibin aşkera bûn. Li gorî qanûn formula ku PDK êdî tevlî hilbijartina 10'ê hezîranê bibe nema. Hin hêzên herêmî û navneteweyî niha li formulek ku PDK beşdar bibe digerin. Lê hemû partî, saziya hilbijartinê ya federal û YNK dibêjin pêwîste hilbijartin di roja xwe de ango 10'ê hezîranê pêk bê.

Di vê navberê de serokê herêmê Nêçîrvan Barzanî jî dixwaze ev biryar pêk were. Ji xwe yê ku ev biryar îmze kirî Neçîrvan Barzanî bi xwe ye. Di nava vê aloziyê de Neçîrvan Barzanî cuda, Mesûd Barzanî û kurê wî Mesrûr jî cuda tevdigerin. Tê gotin ku Barzaniyan di nav xwe de kar dabeş kirine. Lê wer xuyaye ne wisa ye. Ji ber ku Mesrûr, Neçîrvan bêbandor kiribû, Neçîrvan jî niha vê yekê weke firsendekê dibîne ku Mesrûr li derveyê hikûmetê bihêle.

Bi kurt û kurmancî PDK dibîne ku beşdarî hilbijartinan bibe ew ê bi ser nekeve. Winda dike û bi rêya rewa û qanûnî neçare derveyê desthilatdariyê bimîne. Bêguman PDK tiştek wiha qebûl nake. PDK bixwaze jî Tirkiye vê yekê qebul nake!. Ji ber vê sedemê PDK li formulek bêyî hilbijartin digere ku desthilatdariya xwe bidomîne. Ev jî ne mûmkûn e. Ji xwe dadgeha federal gelek erkên herêmê betal kiriye. Ev yek jî her ku diçe PDK'ê tengav dike.

Di rewşa heyî de 3 senaryo hene ku li ser têne nîqaşkirin; Yek; PDK hilbijartinê boykot bike û beşdar nebe. Ev tê wê maneyê ku PDK ew ê li derveyî hikûmet û parlementoyê bimîne. Neçare parlemento û hikûmeta nû nas bike. Hikûmeta nû jî ew ê bi serokatiya YNK'ê were avakirin. PDK vê yekê qebûl nake. Yanê senaryoya yekem nameşe. PDK û Tirkiye tiştek wiha nakin. Duyem; Ji ber ku êdî PDK nikarin beşdarî hilbijartinên 10'ê hezîranê bibe, dikare partiyek din destek bike. Ev jî ji wan xeter e, dîsa derveyî desthilatdariyê dimînin. PDK formulek derveyî desthilatdariyê naxwaze û qebûl nake. Senaryoya sêyem ev e; PDK nehêle ku li herêmên xwe sandoq werin danîn û hilbijartin pêk were. Li gorî liv û tevgerên wan xuyaye ku PDK vî tiştî dixwaze. Ya rastî xetereya mezin jî ev e. Di rewşek wiha de ew ê li herêmên derveyî PDK hilbijartin pêk werin. Bafel Talabanî got, 'Li Hewlêrê li mala xwe be jî em ê sindoqan deynin.' Yanê li Hewlêr 10 deng jî werin bi karanîn derbasdar in. Eger PDK bêje em beşdar nabin, li herêmên xwe sindoqan danaynin û encamên hilbijartinê nasnakin wê demê Dadgeha Federal a Iraqê dikare PDK'ê derveyê qanûn îlan bike. Di rewşek wiha de ji xwe wezîfeya Neçîrvan Barzanî, Mesrûr Barzanî û Parlamentoya Herêmê bi dawî dibe. Dadgeha Bilind dikare statûya herêmê jî betal bike. Wê demê rêveberiya navendî ya Iraqê dikare dest deyne ser hemû erkên herêmê. Di rewşek wiha de PDK yan wê xwe bispêre Tirkiyeyê yan jî teslîmî Iraqê dibe. Lê li aliyê din ji ber ku di serî de YNK û partiyên din beşdarî hilbijartinê dibin herêmên ku ew lê bi hêzên dikarin werin nas kirin. Ango Herêma Federe ya Kurdistanê tenê dikare bi Silêmanî û Helebçê re were sînordarkirin.

Ji ber vê yekê rewşa heyî gelek xetere ye. Mesûd Barzanî di sala 2017'an de referanduma serxwebunê pêk anî û di encamê de nîviyê axa herêmê teslîm kir. Bi vê siyaseta xwe ya niha jî dixwaze ji nîvê mayî nîvê din jî bide windakirin.

Di serî de Amerîka, welatên Ewropa û hêzên herêmî dixwazin hilbijartin çêbibin û PDK jî beşdar bibe. Saziya hilbijartinê ya Iraqê di meha tîrmehê de tê guhertin ji ber vê yekê divê beriya wê hilbijartin çêbibin. Neçîrvan Barzanî ji bo vê aloziyê van roja diçe Îranê. Eger daxwazên PDK'ê pêk were (ku zehmet e) hilbijartin werin taloqkirin jî wê krîzek din dest pê bike. Her wiha di rojên pêş de Tirkiye bi alîkariya PDK li dijî PKK'ê dixwaze dest bi êrîşek nû bike. Ev yek PDK'ê tengavtir dike. Piştî 30 salan cara yekem ku rewşa statûya li Başûr ewqas dikeve xetereyê. PDK, bi taybet malbata Barzanî weke qeyûman dest danîne ser destkeftiyên gelê kurd ku bi berdêlên giran hatine girtin. Gelê kurd ji bo ku bibin xwedî statû bi hezaran şehîd dan. Lê îro ji ber siyaseta şaş, berjewendiyên malbatî û yên ji bo Tirkiyeyê ev statû bi têkçûnê re rû bi rû ye.

# Dîplomasiya şer



Xweşkanî

Felemez Ulug

Tê payin ku şefê rejîma faşîst û qirker Edogan û şandeya pêre serdana Bexdayê bike. Demek dirêje wezîrên Erdogan ji bo vê hevdîtinê bi aliyên cûda re di nava peywendiyê de ne. Tê gotin di rojeva Erdogan de têkiliyên bazirganî, peymanên petrol û meselaya avê heye. Lê yek ji mijarên girîng jî şerê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Bi taybet ev demek dirêje dewleta tirk a dagirker ji bo rêveberiya Iraqê jî bikşîne nava xeta dij-kurd di nava hewldanan de ye. Wisa diyare ku wê ev mijar yek ji rojevên herî girîng ên hevdîtina Erdogan ya li Bexdayê be.

Beriya em bahsa hevdîtina Erdogan bikin divê em rewşa li herêmê, bi taybet jî rewşa li başûrê Kurdistanê û PDK'ê baş fêm bikin. Ger îro dewleta tirk wisa bi awayekî derqanûnî û terorîstî mudaxeleyî karê navxweyî yê Iraqê û başûrê Kurdistanê dike ev bi saya hevkariya PDK'ê ye. Di şerê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê de jî PDK û malbata Barzanî ji bo dewleta tirk a dagirker xwedî girîngiyek mezin e.

Dewleta tirk li gorî xwe dibêje; "Min beşekî mezin ê bBakurê Iraqê bi dest xistiye." Bi gotinek din dagirkeriya xwe ya li başûrê Kurdistanê berfireh kiriye. Bi saya vê dagirkeriyê hewl dide li seranserî herêmê bibe xwedî gotin û mudaxeleyî karê navxweyî yê Iraqê jî bike. Li gel vê dagirkeriyê bazirganiya deriyê Xabûr, peymanên petrolê û çeka avê jî weke qozekî mezin bi kar tîne. Jixwe yên dewleta tirk kêmekî jî nasdikin dizanin ku ew çendî ji exlaqê siyasî û civakî dûr e, dikare ji bo berjewendiyên xwe her cûre qirêjiyê bike. Bi taybet jî ji bo gelê kurd li herêmê nebe xwedî îrade û deskeftiyan bi dest nexe her tiştî dike.

Di bin navê şerê li dijî tevgera azadiyê de li herêmê ji xwe re hevkar çêkiriye. Bi destê van hevkarên mîna PDK'ê li başûre Kurdistanê destkeftiyên gelê kurd xistiye bin xetereyeke mezin. Di halê heyî de statûya herêma federe jî di nav de li ser hebûna başûrê Kurdistanê gefên mezin hene ku ev jî di encama lîstik û fêlbaziyên dewleta tirk de pêş dikevin.

Tê payîn ku di 10'ê hezîranê de hilbijartinên parlamentoya başûrê Kurdistanê bên lidarxistin. Ji ber ku ev du sal in hilbijartin li ser daxwaz û israra PDK'ê tên paşxistin êdî kes bawerî bi hikûmeta herêmê nayne û dibêjin ev hikûmet bi awayekî neyasayî li ser hikûm e. Hilbijartinên ku temînata rewabûn û nîşaneya îradeya gel in ji gelek milan ve xwedî girîngiyek mezin in. Rêveberiya PDK'ê ji ber ku dizane xelkê herêmê ji ber siyaseta wê ya hevkariyê û dij-kurd acize, ev acizî wê bandorek mezin li hilbijartinê bike hincetên pûç û vala xwe ji hilbijartinê kişand. Li gorî daxuyaniya Dadgeha Federal a Iraqê divê hilbijartin di dema xwe de pêk bên û êdî dema serlêdanên ji bo beşdariya hilbijartinan qediyaye. Ev jî dide aşkerakirin ku wê PDK beşdarî hilbijartinan nebe. Lê ger hilbijartin pêk neyên ango rewşekî cûda derkeve holê wê demê çi dibe? Pirsa girîng ku dewleta tirk li pê çi ye?

Li gorî qanûnên Iraqê ji derveyî rewşên awarte û bi erêkirina Dadgeha Federal a Iraqê ger hilbijartin di dema xwe de pêkneyên mafê Iraqê heye ku statûya federal ji herêma başûrê Kurdistanê bigire. Ev jî dide aşkerakirin ku gotinên PDK bi deskeftiyên gelê kurd ên bi berdêla xwîna deh-hezaran şahîdan hatine bi destxistin dilîze ne vala ne.

Bêguman ev pêşketinên li herêmê diqewimin ger mirov ji derveyî dewleta tirk binirxîne wê bibe xefletiyek mezin. Dewleta tirk a dagirker ji bo li herêmê bigihêje armanca xwe ev demek dirêje bi awayekî pir zirav dixebite. Li gelek navendên cûda ên herêmê torên xwe yên îstixbaratê avakirine, bi kesên ku kişandine aliyê xwe di nava siyaseta herêmê de jî mirov çêkirine. Ev ne bes e, PDK a ku berjewendiyê xwe di ser berjewendiyên gelê kurd de dibîne di encama hin berdêlên pûç û vala de kişandiye aliyê xwe. Niha di encama vê hevkariyê de PDK li herêmê bûye hêza herî mezin a berjewendiyên dewleta tirk diparêze. Hewl dide vê hevkariyê jî di bin navê şerê li dijî tevgera azadiyê de veşêre. Lê êdî ji gelek aliyan ve aşkera bûye ku PDK'ê bi her awayî teslîmî dewleta tirk a dagirker bûye û nikare derkeve ji derveyî planên ku ew diyar dike.

Raste dewleta tirk di şerê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê li herêmê herî zêde PDK da pêş. Rêveberiya PDK'ê hemû derfetên hikûmeta herêmê ji bo di vî şerê li dijî gelê Kurd de bi ser vikeve seferber kir. Di vê oxirê de ewqas îmkan seferber kirin ku roj hat mûçeyên karker û karmendên herêmê birîn, perê wan dan pêşmergeyên xwe ji bo motîveyî şer bikin. Ev ne bese ji bo tevgera azadiyê bişkînin nava şer serî li her cûre provokasyonê jî dan. Tevî van hemû hewildanan jî gerîlayên azadiyê neketin xefka xof a PDK'ê û dewleta tirk. Dem hat bi operasyonên şoreşgerî derbên herî giran jî li van hewldanên ku dixwazin îradeya gelê kurd tine bikin dan. Stratejiya dewleta tirk ango ya deshilata AKP/MHP'ê ku li qadên Herêmên Parastinê yên Medyayê negihaşt armanca xwe rê li ber rewşek cûda vekir. Lewma îro şefê rejîma faşîst Erdogan hewl dide eniya dij-kurd berfireh bike û ji xwe re hevalbendên nû ava bike.


Her kesê ku geşedanên li herêmê diqewimin dişopîne dibêjin wê dewleta tirk li dijî tevgera azadiyê dest bi êrîşek berfireh bike. Raste ev îhtîmal heye. Jixwe PDK ji bo xwe ji vê rewşa kambax xelas bike û hilbijartinên li herêmê bi awayekî bide betalkirin vî şerî ji bo xwe xelasiyek mezin dibîne. Ev hêvî û daxwaza rêveberiya PDK'ê ye, lê gel bi tu awayî nayê vê listikê û ji bo ev senaryo bi ser nekeve jî îradeya xwe datîne holê.

Di rewşeke wisa de Erdogan diçeserdana Bexdayê. Çavê gelek kesî li vê hevdîtinê ye. Piştî vê hevdîtinê wê şefê rejîma faşîst û qirker bi şandeya pêre serdana Hewlerê jî bike û li gel hevkarên xwe rûne. Diyare gelek kes bi hêviyên mezin li benda vê hevdîtinê ne. Divê bê zanîn ku êdî dagirker nikarin li ser qedera kurdan gotinê bibêjin. Gelê kurd di hilbijartinên 31'ê Adarê de darbek giran li deshilata faşîst a AKP/MHP'ê da. Bi sekin, helwest û têkoşîna xwe ve diyar kir ku êdî ew dizane ji bo çi şer dike û têdikoşe. Lewma bazarên wisa sivik û pûç wê nikaribe gelê kurd û têkoşîna azadiyê ji meşa serketinê dûr bixe. Her kesê ku dijberî vê difikire di nava xefletek mezin de ye.

# Plana tevlîhevkirina Rojhilata Navîn

## Bi projeyên veşartî û li gorî berjewendiyên hinek derdoran li Rojhilata Navîn tevlîheviyek tê derxistin. Pevçûnên di navbera Îran-Îsraîlê de xizmetî vê projeyê dike

Zinar Ronî



Rojhilata Navîn dikele. Bi qasî kela germê kela siyaset, şer, pevçûn û nakokiyan jî zêde dibe. Bi êrîşa Îranê ya li ser Îsraîl nepeniya pêşeroja Rojhilata Navîn zêdetir bû. Gelên Rojhilata Navîn roj tune ku bi geşedanek nû şiyar nebin. Şer bûne şêwaza jiyana wan. Dema bê lêkolînkirin dê bê dîtin ku tu erdgnîgarî wekî Rojhilata Navîn nebûye qada şer û pevçûnan. Li Ewropayê şerên 30 salan, şerê sedsalan jî negihîştine asta pevçûnên li vir. Bi sed salan e nakokiyên siyasî, olî, mezhebî, çandî, etnîkî û hwd. didomin.

Îsraîlê di 2'yê nîsanê de li Sûriyeyê êrîşî balyozxaneya Îranê kir. Di encama êrîşê de gelek fermandarên artêşa Îranê hatin kuştin. Hinek ji van fermandaran endamê muhafizên şoreşê bûn. Îranê sond xwar ku dê tola wan ji Îsraîlê bigire. Îran li ser soza xwe ma û cara yekem bi sedan dron û muşekan rasterast Îsraîl hedef girt. Rayedarên Îranê piştî êrîşî bi kurtasî wiha gotin: "Me êrîşeke serkefî pêk anî. Me tola fermandarên xwe girt. Em Îsraîlê hişyar dikin ku carek din nekeve xetereyeke wisa. Êrîş ji bo carekê bû. Heke Îsraîl bersiv nede em ê jî êrîşa xwe bi dawî bikin." Ji aliyê din ve Îsraîlê jî anî ziman ku di encama êrîşa Îranê de ji bilî zirarên piçûk tu windahiyên wan çênebûne. Lê li gorî dîmenên derketin holê xuya dike ku herdu alî jî rast nabêjin. Herdu alî rastiyê ji me baştir dizanin. Lê ya muhîm ne rastî ye ya muhîm ew e ku kîjan alî bi propagandayê bi ser bikeve ye. Vê êrîşê çend encam derxistin holê:

***1-*** Cara yekem Îranê rasterast êrîşî Îsraîlê kir. Vê jî bi xwe re şikandina ramana ku tu derdor nikare êrîşî Îsraîlê bike anî.

***2-*** Ji bo îmhakirina dron û muşekan hêzên amerîkî û Îngilîstanê ketin dewrê. Li gel alîkariya kooalîsyona navdewletî jî hinek muşek û dron li nav sînorên Îsraîlê ketin. Vê jî nîşan da ku Kubeya Hesinî ya parastinê ya Îsraîlê wekî tê zanîn ewqas ne pêşketî ye. Di êrîşeke pir berfireh û domdar de ev pergal bi tena serê xwe nikare Îsraîl biparêze.

***3-*** Êrîşa Îranê li gorî texmînên dihate kirin ne dijwar bû. Bi dron û muşekên ku rotaya wan diyar e êrîş pêk anî. Îranê bixwe jî dizanibû ku dê ew dron û muşek werin xistin lê dîsa jî xwest hêza xwe nîşan bide. Ji dayîna zirarê zêdetir xwest hêza xwe nîşan bide.

***4-*** Iraq û Urdunê hewl dan ku dron û muşekên Îranê bixin. Urdunê gelek xistin xwarê. Vê jî nîşan da ku di şerekî giştî de Îran piştgiriyeke mezin ji misilmanan nagire.

***5-*** Îsrîalê dixwest germegerm bersiv bide Îranê lê Amerîka destûr neda. Her çiqasî lijneya şer biryara bersivdayînê girtibe jî heya niha bersivek nehatiye dayîn. Ev jî nîşan dide ku Amerîka şerekî mezin naxwaze.

***6-*** Îranê êrîşa xwe bi carekê re sînordar girt. Di serî de êrîşeke pir bikontrol plan kiribû. Piştî êrîşê derket holê ku bi riyên dîplomatîk der barê êrîşê de agahî hatine dayîn. Berî çend salan bi hevkariya Îsraîl û Amerîka fermandarê giştî yê Hêzên Kudusê Qasim Silêmanî li Iraqê hatibû kuştin. Piştî kuştina Silêmanî Îranê êrîşî baregehê Amerîkayê kir. Di encama êrîşê de li gorî Îranê bi dehan leşkerên amerîkî hatibûn kuştin û bi sedan leşker jî ji ber bandora êrîşê ji ser hişê xwe çûbûn. Lê bi daxuyaniya serokê Amerîkayê yê berê Donald Trump derket holê ku Îranê berî êrîşê agahî daye û Amerîka jî tevdîrên xwe girtine. Ango pevçûn û êrîşeke bikontrol di navbera Îran-Îsralê de didome.

Pevçûna Îran-Îsraîlê encama serneketina Bihara Ereban e. Bihara Ereban li Rojhilata Navîn wekî serîrakirina gelan derket holê. Lê di demeke kin de hem tevgerên olperest-mezheperest xwestin van serhildanan li gorî xwe dizayn bikin hem jî pergala kapîtalîst xwest bi van serhildanan li Rojhilata Navîn li gorî xwe rêveberên rewa ava bike. Mixabin herdu alî jî negihîştin armanca xwe. Li Misirê bi darvekirina Serokkomar Mursî xeyala tevgera birayên misilman têk çû. Li Suriyê bi rizgarkirina Reqa xeyala DAIŞ'ê hilweşiya. Wekî din jî bi mayîna Beşar Esad xeyala dîzaynkirina pergala kapîtalîst a li Rojhilata Navîn kete xetereyê. Koalîsyona navdewletî ku dixwest Esad ji ser kar bişîne di dawiyê de mecburî Esad bû. Gelek rêxistin û tevgerên ku Mossad û CIA bixwe piştgirî dane wan niha bûne bela serê cîhanê. Bi êrîşa 7'ê cotmehê re rewşek çiqas xetere derketiye holê. Her çiqasî ev êrîş bi piştgiriya Îranê (alîkariya çekdarî-malî) û Tirkiyeyê (piştgiriya siyasî-dîplomatîk) pêk hatibe jî derket holê ku kontrolkirina tevgerên radîkal ên olî zehmet e.

Heya ku tevlîheviya li Lîbya, Sûriye û Iraqê didomiya Îsraîl rehet bû. Îsraîl ev pêvajo ji bo xwe baş bi kar anî. Bi dewletên ereb re peymanên di çarçoveya protokola Abraham de îmze kirin. Peymanên dîplomatîk û bazirganiyê mohr kirin. Lê ev li xweşiya Îran û Tirkiyê nediçû. Li Tirkiyeyê qeyrana aborî kûr dibû û desthilata AKP-MHP diket xetereyê. Serhildanên Jin Jiyan Azadî yên ku li rojhilatê Kurdistanê dest pê kirin û li tevahiya Îranê belav bûn textê rejîma melayan hejand. Lewma êrîşa 7'ê cotmehê plan kirin. Bêguman yek ji sedemên din jî projeya riyên enerjiyê bû. Dihate payîn ku xeteke enerjiyê bi ser Îsraîl re derbasî Ewropayê bibe. Îran jî dixwaze li ser projeya Bendera Faw bibe xwedî gotin. Tirkiye jî ji bo vê projeyê li gorî xwe dizayn bike bi PDK'ê re tevdigere. Lê pêşketin ne li gorî dilê tu hêzan dimeşe. Tenê bi kêrî tevlîhevkirina Rojhilata Navîn tê. Bi projeyên veşartî û li gorî berjewendiyên hinek derdoran Rojhilata Navîn di tevlîheviyê de dimîne. Pevçûna di navbera Îran-Îsraîl de jî xizmetî planê dike û fêdeya wê tuneye.

Ne Îran bi hemû hêza xwe diwêre li hemberî Îsraîlê şer bike, ne jî NATO şerekî mezin dide ber çavên xwe. Bi êrîşên kontrolkirî û tevgerên di bin bandora xwe de dixwazin hêza xwe nîşanî hev bidin û îradeya hev biceribînin. Ev jî nîşan dide ku planên tu aliyan ên çareseriyeke mayînde tuneye. Di plan û bernameyên hêzên hegemonîk û dewletên herêmî de çareseriyên ji bo azadî û demokrasiyê tune ne. Ji ber ku mijar berjewendiyên aborî û siyasî ne çareseriyeke mayînde jî pêk nayê.

Di rojên pêş de Serokkomarê Tirkiyeyê dê biçe serdana Iraqê. Dê biçe serdana rêveberiya başûrê Kurdistanê jî. Serdana Erdogan ne ji bo xêrê ye. Tirkiye dixwaze zêdetir têkeve nav karên Iraqê. Dixwaze herêmên ku li başûrê Kurdistanê dagirkirine berfireh bike. Tirkiye dixwaze li Rojhilata Navîn hegemonya xwe ava bike. Lê heya niha hema bêje hemû projeyên wê di dest de mane. Li Sûriyeyê negihîşt encamê, li Lîbyayê negihîşt encamê, li Misrê negihîşt encamê, neçar ma bi dewletên ereban re careke din têkiliyê deyne. Niha jî dixwaze bi rêveberiya Iraqê re hinek projeyan bixe meriyetê. Ev proje dê şer bi xwe re bîne. Tirkiye hêza xwe ji şer digire. Îran û Tirkiye her çiqasî li hemberî Îsraîlê wekî ku bi hev re ne xuya bikin jî herdu dewlet jî dixwazin bibin hegemonên herêmî lewma herdu dijberê hev in. Li Sûriyeyê Îran piştgiriya Esad dike, Tirkiye jî piştgiriya çeteyan dike. Erdogan bi serdana xwe ya Iraqê dixwaze li hemberî Îranê destê xwe xurt bike. Erdogan dixwaze windahiyên li Sûriye û Lîbya, li Iraqê telafî bike. Ji bo vê jî tevgera azadiyê ji xwe re dike hincet. Erdogan di pêvajoya hilbijartinê de diyar kir ku ew ê şerê li Başûr fireh bikin û şerê dagirkirina Rojava bidomînin. Lê şert û merc didin xuyakirin ku êdî Erdogan wekî berê nikare rehet tev bigere.

Qeyrana Rojhilata Navîn pir kur e. Lê ev qeyran ne bi hilweşîna Îsraîlê çareser dibe ne jî bi destwerdana Îranê safî dibe. Ev qeyran encex bi çareseriyeke ji bo gelan çareser dibe. Dewletek hilweşe jî dê dewletek din cihê wê bigire. Çareserî pêşxistina pergal û hişmendiya demokrasî û azadiyê ye. Ew jî bi paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk pêkan e. Rojava jî mînaka herî berbiçav e. Wekî din plan û projeyên hemû dewletan ji tevlîhevkirina Rojhilata Navîn wêdetir tu fêde nadin.

---



Kurdistan Lezgiyeva

# Siyaseta derve êdî ne girîng e?

***''Exlaq çawa ku wijdana kolektîf a civakê ye, polîtîka jî aqilê hevbeş ê civakê ye. Wezîfeya exlaq çawa ku pêkanîna herî baş a xebatan e, erka polîtîkayê jî dîtina herî baş a xebatan e. Ji bo pêkanîna vê, lazime mirov xebatan baş nas bike, yanî bibe xwedî îlîm, zanyariyê û exlaqê nas bike. Şiklê herî berbiçav ê polîtîkaya civakî siyaseta demokratîk e. Mirov dikare siyaseta demokratîk weke hunera azadbûnê jî pênase bike.''***

***Rêber Apo***

Îro em dibînin ku dewletên nûjen bi pirsgirêkên ewqas giran re rû bi rû ne ku siyaseta derve li her derê dimeşîne li ber çavan e. Ev jî bo welatên rojavayî, Rûsya, Çîn, Hindistan û her kesê din derbas dibe û tiştê ku teoriyên heyî bi tenê ji ber metodolojiya xwe nikaribin fam bikin, rewşa heyî girîng dike.

Yek ji bandorên balkêş ên herdu şerên cîhanî yên sedsala borî; derketina çend hêzan bi stokên cidî yên çekan, ku bikaranîna wan a girseyî dikare li ser rûyê erdê bibe sedema rawestandina jiyana civakî.

Çalakiyên polîtîkaya derve yên dewletan di tevahiya rêzekarên ku divê bi wan re mijûl bibin de derket. Ew tirsa ku gav bi gav mezin dibe û di dawiyê de bi xurtî hatiye rûxandin li ser îhtîmala ku felaketek leşkerî di encamên wê de giştî û neveger be, bi tundî mijarên aramiya navneteweyî di serê lîsteya pêşîn de bala raya giştî dikşîne ser xwe.

Wekî din, mezinbûna girîngiya mijarên ku rasterast bi faktorên pêşketina derveyî ve girêdayî ne ji hêla bidestxistina şerên girseyî û gerdûnîbûna aborî ve hatiye hêsankirin.

Herî dawî, heta radeyekê pirsgirêkên pêşketinê û heta hebûna dewletê bi karên ku di qada navneteweyî de çareser dike ve girêdidin. Bêguman, ev yek bi taybetî bi welatên navîn û piçûk re têkildar bû, ji bo ku cîhana nûjen pir dijwar bû ku derfeta hebûna bi tevahî serbixwe peyda bike.

Lê, di mijara hêzên herî mezin de jî, pirsgirêkên polîtîkaya derve yên sedsala borî ew qas girîng derketin ku hema hema li ser asta pirsgirêkên rojevek tenê navxweyî rabûn.

Aboriya bazarê ya gelemperî û vebûna bazarên biçûk bi rastî firsenda hikûmetên cihêreng kêm kiriye ku bi tevahî pîvanên serbixwe pêşketina hundirîn destnîşan bikin.

Di encamê de ev hizra bihêztir bûye ku serkeftin an têkçûn di çareserkirina karên herî girîng ên lihevanîna hevwelatiyan bi nîzama navxweyî ya heyî re, bi riya peywendiyên derve û têkelkirina welat di nav pergala cîhanî de çareser dibe ku bixwe dê piraniya pirsgirêkan çareser bike.

**Destwerda siyaseta rojane**

Encama vê ya pratîkî, mezinbûna sazûmanên dîplomatîk û bi giştî saziyên têkiliyên derve ku ji aliyê pîvanên dîrokî ve nayê xeyalkirin bû. Hejmarek mezin ji karbidestan, bi hesta girîngiya kar û pîşeya xwe, niha berpirsê peywendiyên derve yên welatên xwe ne. Û di vî warî de pergala cîhanî ya dewletan bi rastî ber bi modela serdema navîn a Ewropayê ve diçû ku tê de hikûmet kêm dikaribûn destwerdana jiyana rojane ya babetên xwe, nemaze jiyana giyanî bike û dilxweş bû ku tenê bi karên siyaseta derve re mijûl bibe.

Parastina serweriyê di wateya kevneşopî ya peyvê de tenê ji aliyê hêzên ku heta radeya herî mezin pêşengiya neteweyî li ser cîhanê diparêzin, dikaribû bihata kirin. Berî her tiştî, ew Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê bû ku pêşaniya wê ya siyaseta navxweyî li ser siyaseta derve hêdî hêdî bû taybetmendiyek bêhempa ku hêza super ji hemû welatên din ên cîhanê cuda dike.


Lêbelê, niha ev fermana ku her kesî xweş dike, dest pê dike.

Nîşaneyên yekem ku tişt ber bi tiştek bingehîn nû ve diçin bi derketina van pirsgirêkên "gerdûnî" yên wekî diyardeyên cihêreng ên guhestina avhewa, înternet û agahdariyê û îstîxbarata çêkirî ve girêdayî bûn.

Henry Kissinger di nav ramanwerên sereke yên serdema me de yekem bû ku bal kişand ser vê yekê ku "pirsgirêk gerdûnî ne, lê çareseriyên wan neteweyî dimînin."Ji ber vê yekê, zanyar û siyasetmedarê navdar xwest ku balê bikişîne ser vê yekê ku civaka cîhanî ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku her kesî eleqedar dike ne amade ye ku nêzîkatiyên yekgirtî pêk bîne.

# 126'emîn salvegera rojnamegeriya kurdî

Di serdema ku rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike da, rûmeta rojnameyan gelek zêde dibe. Hecî Qadirê Koyî yê ku di gelek çavkaniyan de wekî mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan tê nîşandan, zêde li ser girîngiya rojnameyan rawestiyaye



Ahmed Kanî


Di serdema ku rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike da, rûmeta rojnameyan gelek zêde dibe. Hecî Qadirê Koyî yê ku di gelek çavkaniyan de wekî mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan tê nîşandan, zêde li ser girîngiya rojnameyan rawestiyaye.

Rojnameya pêşîn a bi kurdî Rojnameya Kurdistanê ye. Wek hemû rojnameyên cîhanê, rojnameya Kurdistanê jî piştî pêvajoyeke dûr û dirêj a di qada çapemeniyê da karibûye derkeve pêşberî xwendevanan. Ji bo ku baştir mijar bê fêmkirinê pêwîst e em bi gelemperî li ser dîroka çapxane, çapemenî û rojnamegeriyê hin agahiyan bidin.

Gelo dema ku Mîqdad Mîdhet Bedixan dest bi weşana rojnameyê dike, atmosfera welêt û ya cîhanê çawa bûne? Li gor rewşa ku em li vir dibînin, em dikarin bibêjin ku rojnameya kurdî bi sed salan piştî rojnameyên cîhanê derketiye holê. (Kaya, 2010:13) Bi kurtî mirov dikare bibêje ku derengmayîna derketina rojnameya kurdî girêdayê bi gelek mercan ve ye. (Hasanpour, 2005:275) Wek pêşketina teknîkî û hin îcadan. Her îcadek jî ji hin pêwîstiyan derdikeve holê. Wek mînak heta îcada nivîsê çênebûya dê rojname jî derneketana. Nivîs di destpêkê da ji bo pêwîstiya hev agahdarkirinê wek wêne li Misrê dertê holê. Piştê nivîsê kaxiz, piştê îcada kaxiz îcada çapxaneyê jî çênebûya dîsa rojname dernediketin. Çapxane di sala 1440'an da li Almanyayê ji aliyê Johann Gutenberg ve hat îcad kirin. Li gorî Emîr Hasanpour cara pêşîn di sedsala duyem da, li Çînê çapxane hatiye îcadkirin. (Hasanpour, 2005:276) Rojnameya pêşîn jî nêzî du sed salan piştî îcada çapxaneyê li Almanyayê di sala 1609'an da bi navê Avisa, Relation oder Zeitung derket. (Dilgeş, 2017:14) Dîsa li Almanyayê li bajarê Kolnê, di sala 1610'an da bi navê Wurdige Zeitung rojnameyek derket. Piştî Almanyayê li Holandayê jî di sala 1619'an da bi navê Nieuwe Tijdinghe rojnameyeke din dest bi weşana xwe dike.

Li Birîtanyayê (London) rojnameya pêşîn bi îngilîzî di sala 1622'yan da bi navê The Weekly News From Italy and Germany derket. Li Fransayê di sala 1631'an de, rojnameyek bi navê La Gazette ji aliyê Théophraste Renaudot ve tê derxistin ku wek rojnameya pêşîn a xwedî taybetiyên rojnameyên îroyîn tê qebûl kirin. Li Îtalyayê (Roma) rojnameya pêşîn di sala 1640'î de, bi navê Gazeta Puplica derketiye. Li Polonyayê jî di sala 1661'an de rojnameya pêşîn dertê. Li Amerîkayê rojnameya pêşîn nêzîkê sed sal piştî Almanyayê di sala 1704'an da dest bi weşanê dike.

Împaratoriya osmanî wek gelek kar û barên nûjen yên din li hember bikaranîna çapxaneyê jî gelek astengiyan derxistiye. Cara pêşîn rojnameyek bi navê Takwîm-î Waqayî di 1831'ê de, wek rojnameyeke fermî ji aliyê dewletê ve hatiye derxistin. Piştî wê di sala 1840'î da ji aliyê William Churcilê (?-1864) ku hemwelatiyê Birîtanyayê ye, ve Cerîde-î Hawadîs tê derxistin û di şerê Kirimê (1854) da ku di navbera Dewleta Osmanî û Dewleta Rûsî da ye, cara pêşîn rojnamevaniya qada şer derdikeve. Di sala 1860'î da, ji aliyê Agah Efendî (1832-1885) ve Tercuman-î Ahwal hatiye derxistin ku wek rojnameya pêşîn a ji aliyê kesên ne fermî, bi tirkiya osmanî hatiye weşandin, tê qebûlkirin. Mirov dikare bibêje ku ermeniyan berî tirkan dest bi weşandina rojnameyan kirine. Wek mînak di sala 1839an da, li Îzmîrê rojanmeyeke bi navê Şafakê bi zimanê ermenî derdixin. (Dilgeş, 2017:16) Rûman di sala 1866'an de bi navê Anatolî û Cihûyan jî bi navê Şerqiye di sala 1867'an de rojname derxistine.




Lê belê kurdan ji aliyê bi cihkirina zanîn û berhemên wek rojnameyan ji van kêmneteweyên xeyrêmislim derengtir dest bi derxistina rojnameyê kirine. Rola mamoste û zanayarê kurd Hecî Qadirê Koyî (1815-1897) di derxistina rojnameya Kurdistanê da girîng e. Ji ber vê divê em bi kurtahî hin agahîyan li ser jîyana wî bidin.

Di serdema ku rojnameya Kurdistanê dest bi weşanê dike da, rûmeta rojnameyan gelek zêde dibe. Hecî Qadirê Koyî yê ku di gelek çavkaniyan da (Vali, 2005:71-75) wekî mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan, (Yekdeş û yd. 2014:348) yên wek Mîqdad Mîdhet Bedirxan, Evdirehman Bedirxan û hwd. tê nîşandan, zêde li ser girîngiya rojnameyan rawestiyaye.

Mirov dikare bibêje bandora Hecî Qadirê Koyî li ser derxistina rojnameya Kurdistanê çêbûye. Ji gelek çavkaniyan û ji dîwana wî em fêm dikin ku gelek mînakên rojnameyê ku pesnê zanîn û xwendinê didin ji ber fikrên Koyî hatine girtin. Hecî Qadirê Koyî (Koyî, 2004:85), di sala 1815'an de li başûrê Kurdistanê, li gundê Gorqerecê yê bajarê Koyê hatiye dinê. Li medreseyên Kurdistanê perwerde dibîne. Ji ber ku Hecî zêde li pey zanînî geriyaye di dawiyê de, di sala 1864'an de berê xwe dide Stenbola ku bûye navenda zanyarên serdema osmanî. Li wê derê Mem û Zîna Ehmedê Xanî û berhemên wî yên bi ramanên neteweyî dagirtî dixwîne.

Di hejmara sêyem a Rojnameya Kurdistanê da behsa mirina wî ya salek berê (1897) tê kirin. Heft malikên ku Koyî ji helbestek xwe li ser destxeta Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi destê xwe nivîsiye hatine weşandin. Di kovara Hawarê hejmara 33'yan de, di bin sernavê "Klasîkên Me" da Celadet Bedirxan vê helbestê nivîsiye û gotiye ku ev li ser 'Memozîna bavê min' a destxetê ji aliyê Koyî ve hatibû nivîsîn. (Hawar, 1998:817) Ji xwe em dibînin ku di hejmara duyem a Rojnameya Kurdistanê de, hin bi hin dest bi çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî tê kirin.

Di dema ku Rojnameya Kurdistanê der ketiye da, hemû cîhan di bin bandora ramanên nû de ye. Li welatên weke Kurdistanê ku bi piranî di bin desthilatdariya Dewleta Osmanî da bûn, hêdî hêdî hestên neteweperwerî û welatperweriyê bi pêş dikevin. Rojnameya Kurdistanê jî ji aliyê kurdên ku xwediyê van hestan e ve tê weşandin. Rojnameya Kurdistanê, di sala 1898'an de roja 22'yê Nîsanê li paytexta Misirê, li Qahîreyê, ji aliyê Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve tê amadekirin û dest bi weşanê dike. Rojnameya Kurdistanê di çanda nivîskî ya kurdî de weke nîşana destpêka rojnamegeriya kurdî hatiye nirxandin. (Malmîsanij, 2011:11)

Rojnameya Kurdistanê, li gor pîvanên îroyîn ne wek rojnameyeke rojane ye, ji hêla dirêjiya demê ve bêtir dişibe demeke dirêj a derxistina kovarek ku ji panzdeh rojan carekî dertê. Rojnameyên wê serdemê bi piranî rojane derneketine. Di serdema Osmanî da bêjeya "cerîde" bi maneya rojname hatiye bikaranîn. Wek mînak di wê serdemê da ji aliyê Cemîyeta Îttihad a Osmanî ve bi rêveberiya du kurdan, Dr. Îshak Sikûtî û Dr. Evdila Cewdet, bi navê cerîdeya Osmanî rojnameyek (1897-1904) dihat weşandin. (Hanioglu, 1981:34-5) Ew jî wek Kurdistanê rojane dernedikete lê xwe bi navê "Cerîdeya Osmanî" bi nav dikir. (Oguz, 2006) Peywendiya vê rojnameyê bi rojnameya Kurdistanê re hebû. (Tutengil, 2008:90-4)

Ev dema diyarkirî ku wek pazdeh rojan hatibû nivîsîn jî pirê caran têk çûye, hin caran jî şeş mehan zêdetir dem ketiye navbera du hejmarên li pey hev. Wek mînak hejmara 23'yemîn di 24'ê sibatê de, ya 24'emîn di 1'ê îlonê de derketiye.

Di bin navê rojnameya Kurdistanê da, bi tirkiya osmanî wiha dinivîse: "Kürdleri ikaz ve tahsil-i sınayi'e teşvik içün şimdilik on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir/ rojnameyek kurdî ye ku niha ji panzdeh rojan carekî tête weşandin bo kurdan hişyar bike û wan teşwîqê hînkirina pîşeyan bike."

Di hejmara yekem da Mîqdad Mîdhet berî ku bi kurtî armanca rojnameyê binivîse, dibêje ku li dinyayê çiqas misilman hene di hemû gund û bajarên wan de, dibistan û rojname hene ku li dinyayê çi bibe di rojnameyên wan de tê nivîsîn. (Kurdistan, 2006) Piştî vê hinek pesnê kurdan dide û dibêje mixabin heta niha tu rojnameyek kurdan tune ye, ji ber vê ez dê rojnameyekê bi navê Kurdistanê biweşînim. Balê dikişîne ser kêmaniya tiştên nû dertên û daxwazê ji kesên kêmaniyên rojnameyê bibînin dike ku jê re binivîsin. Di hejmara yekem da wiha nivîsiye:

"Heta niha kesek rojnameyeka weha nenivîsiye; ev rojnama min a ha, ya pêşîn e. Loma dê gelek kêmayî hebin. Ez hêvî dikim kêmayiya rojnamê ji min re binivîsin. Hemî tişt dema nû çêdibin kêm in, paşê hingî diçe dikeve rê de." (Bozarslan, 1991:7)

Wêje û Ziman di Rojnameya Kurdistanê da

Rojnameya Kurdistanê ceribandina yekem a bi zimanê kurdî ye ku bi tîpên erebî û bi rênivîsa farsî hatiye çapkirin. Berî vê ceribandinê, berhemên zimanê kurdî bi destan dihatin nivîsîn.

Zimanê rojnameya Kurdistanê di hejmarên pêşîn da bi tevayî kurdî ye. Lê her ku rêveberên rojnameyê ji zimanê kurdî dûr ketine bêtir zimanê siyasî yê wê serdemê ku ew jî tirkiya osmanî bû derketiye pêş. Ji xwe hejmara dawîn êdî bi tevayî bi zimanê tirkî ye. Naverok jî hemû bûye mijarên siyasî. Belkî ji ber vê rewşa wê, êdî derneketiye.

Dema em pêwendiya rojnameyê bi wêjeyê re bigirin ber çavan em dibînin ku di hejmara duyem da, di bin navê rojnameya Kurdistanê de, di kunyeya rojnameyê da bi tirkî 'Bazı ümera-i Ekradın arzularına mebnî bundan böyle ahval-ı cariye ve edebiyat-ı Kürdiyeden dahi bahsolunacaktır' (Bozarslan, 1991:121) dinivîse ku li ser daxwaza hin mîrên kurdan rewşa niha û edebiyata kurdî jî dê bêne behskirin. Ev nivîs di hejmara yekem da tune ye. Di bin vê nivîsê da, di rûpela pêşîn a nasnameya rojnameya Kurdistanê da, jî dîsa bi tirkî dinivîse; nameyên bi erebî, tirkî, farsî ku li gor helwesta rojnameya me ne, dê bi wergera kurdî bêne weşandin. Bi vê helwesta rojnameyê jî em dibînin ku di destpêkê da zimanê kurdî derketiye pêş.

Bi vî awayî di hejmara duyem a rojnameya Kurdistanê de, berî ku dest bi çapkirina beşên "Mem û Zînê" bike daxuyaniyek wiha jî dide: "Hin ji mîr û axayên kurda kaxiz rêkirine ji min re, dixwazin ku ez vê cerîdeyê de behsa halê nuho û edebiyata kurdî, ango hin şê'r û beytên kurmancî binivîsim. Loma, paş nuho, bi îzna Xwedê ez dê behsa halê nuho bikim û her car hin beyt û şê'rên kurmancî û hîkatên qenc binivîsim." (Kurdistan, 2006:18)

Ji hêla ziman ve bi piranî tîpa "n"yê ya di gireka/qertafa pirjimariyê, "an"ê de hatiye avêtin. Hema mirov kare bibêje ku ev rewş heta serdema ku Mîr Celadet Bedirxan rêzimana kurmancî bi tîpên latînî dinivîse heye. Peyva "tişt" wek ku li devera Botanê mê ye hatiye bikaranîn.

Pêwendiya Rojnameya Kurdistanê ya bi wêjeya kurdî re jî di çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî de diyar dibe. Cara yekem e ku Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi rêya Rojnameya Kurdistanê tê weşandin. Berî Rojnameya Kurdistanê hemû Mem û Zîn bi dest dihatin nivîsîn. Ji ber ku temenê rojnameyê ne dirêj bûye, têra weşana hemû malikên Mem û Zînê nekiriye. Heta malika 755'an hatiye weşandin. Malikên 71 û 621'ê di rojnameyê de nehatine çapkirin. Dibe destxeta li ber dest nehatibe xwendin.

**Hejmara 19'emîn a winda ye**

Li gora rêza malikan diyar dibe ku ji malika 578'an heta ya 592'ya 15 malik jî di hejmara 19'an a wenda de hatine çapkirin. Em li virê dixwazin bidin zanîn ku ev malikên Mem û Zînê û nivîsa bi sernavê "Şîrketê Baxiye" diselimînin (îspat dikin) ku hejmara 19'emîn a Rojnameya Kurdistanê derketiye.

Em dikarin di heqê xizmeta Rojnameya Kurdistanê ji bo wêjeyê da bibêjim ku ev 755 malikên hatine weşandin jî xizmetek pir girîng e.

Wek encama em dikarin bibêjin ku ji destpêka weşangeriya kurdî ve zext û zorên li ser berhemên zimanê kurdî her hebûne. Çi pirtûk be wek "El Hedîyetu-el Hemîdîye Fîl-Lugeti-el Kurdîye", bi tevî ku hatiye diyarîkirin ji bo siltanê osmanî Evdilhemîdê duyem jî ji vê fişarê rizgar nebûye. Çi jî rojname be, wek rojnameya Kurdistanê ku ji hejmara yekem ve bi fermana siltanê osmanî Evdilhemîdê duyem, piştî hefteyek di sihê nîsanê da hatiye qedexekirin. (Malmîsanij, 2011:121)

***ÇAVKANÎ***

Bozarslan, M. Emın, Kurdistan Rojnameya Kurdî ya Pêşîn/İlk Kürd Gazete-si (1898-1902), Cild 1, Weşanxana Deng, Çirîya Paşîn, Upsala 1991

Dilgeş, Felat, Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn KURDISTAN, Weşana Nûbiharê, Çapa 2. Stenbol 2017

Hanioğlu, Şükrü, Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi, üçdal Neşriyat, Stenbol 1981 (r.34-35)

Hasanpour, Amir, Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, Avesta 2005

Hawar berg 2. Weşanên Nûdem, Stokholm 1998

Kaya, Fetullah, Kürt Basını/Çapemeniya Kurd, Hîvda, Stenbol Sibat 2010

Koyî, Hacî Qadirê, Dîwan, edt. Arif Zêrevan, weş. Nefel, Sweden, 2004, (r. 85), çapa dijîtal: http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79, 16.12.2013.

Kurdistan Yekemîn Rojnameya Kurdî, Tehran 2006 hejmar: 1, r. 1

Malmîsanij, İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936), Vate, İstanbul 2011

Oguz, Gülser, Teza masterê ya Gülser OĞUZ bi navê "Osmanlı Gazetesi (1897-1904)" ku di sala 2006an de li Zanîngeha Hacettepeyê amade kiriye, di malpera YÖKê de heye.

Tütengil, C. Orhan: "Yeni Osmanlılar"dan Bu Yana İngiltere'de Türk Gazeteciliği 1897-1967, T.İş Bankası Yayınları, İstanbul 2008

Vali, Abbas, Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri/Kokên Neteweperwerîya Kurd, werger: Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, Stenbol 2005

Yekdeş, Ömer Faruk ve Servet Erdem, Tanzimat ve Edebiyat, Osmanlı İstanbul'unda Modern Edebi Kültür, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2014

# Kurdistan de kayê şerê lêşinî

## Weçînayîşê herêmî psîkolojîyê kleptokratan xeribna. Erdogan şerî ra “haware” wazeno. Seba ke Başûrê Kurdistanî îşxal bikero her bazirganîyêka lêşine keno

| Merkezê Xeberan



Seke zanîyeno weçînayîşê 31ê adare ra dima Tirkîya û Kurdistan de rewşa pêroyî vurîyaye. Êdî îqtîdarê AKP-MHPyî “serdest” nîyo. Înan lapata şarî werde. Nê rojan weşîya înan a psîkolojîye qet baş nêasena. Hem Erdogan hem zî Bahçelî her roje vera dînamîkanê welatperest, sosyalîst û demokratan ziwanêkê “hêrişkarî” xebitnenê. Tewr zîyade Bahçelîyî vat ke her çî weçînayîş nîyo, na dewlete weçînayîşan de nêronîyaye. Yanî îradeyê şarî bîle nêşinasneno. Bêguman vatişê Bahçelî esasî vatişê Erdoganî yo. Çike o hertim axayîya mifteyê Erdoganî keno.

Îqtîdarê Erdoganî yanî îqtîdarê heramîyan û dizdan weçînayîş ra dima problemê ontolojîkî reyde ameyo têrî. Seraya “kleptokratî” êdî nêeşkena estbîyayîşê xo bidomno. Çike ekonomî cor ra heta cêr serobin bîya. Girseyî mîyanê xizanîye de ciwîyenê. Roje bi roje enflasyon berz beno. Fîyatê berheman bi destê dezgehanê dewleta tirkan nênê vindarnayene. Hetêk ra zî deynê Tirkîya yê teberî kêmî-zêde bîyo 600 mîlyar dolar. Bankaya Merkezî nêeşkena îstîqrarê fîyatî awan bikero, çike rezervê aye kêmek 65 mîlyar dolar ê. Yew zî mîyanê yew serre de ganî hukmatê Erdoganî fekafek 230 mîyar dolar deyn bido. Gama ke merdim nê parametreyan ano pêser, fikrîyeno ke emrê îqtîdarê Erdoganî zêde derg nîyo.

Îqtîdarê AKP-MHPyî seba ke “hişê” şarî bibedilno, nê rojan hewcedarê şer û pêkewtişî yo. Her rejîmo otorîter xora wina yo. Şer seba înan ge-ge “xelisnayox” beno. Erdogan planê hêrişkerdişê Başûrê Kurdistanî keno. Bi nê hawayî îdareyê Bagdadî û PDK ra hetkarîye wazeno. Eke mabênê terefan de peymana asayîşî bêro îmzekerdene, o wext hukmatê Bagdadî do îstîxbarat peyda bikero û îşxalê Tirkîya do rewa bikero. Heta nika îdareyê Bagdadî fikrîyêne ke zerreyê Iraqî de xeylêk baregehê Tirkîya est ê û estbîyayîşê înan huqûqî nîyo. Nê semedî ra waştêne ke na mesela bêro Neteweyanê Yewbîyayeyan.

**Rayîrê Raverşîyayîşî**

Peymana asayîşî de yew zî babeta Rayîrê Raverşîyayîşî est a. Seke zanîyeno goreyê planî no rayîr kendawa Basrayî ra dest pêkeno û heta Tirkîya şino. Texmînî malbîyayîşê nê rayîrî 20 mîlyar dolar o. Fîrmayê tirkan zî wazenê nê projeyî de ca bigêrê. Bi kilmî hesabê “rantî” kenê. Xora Erdogan û dormeyê ci de hertim “fetîşîzmê rantî” est o. Erdê Kurdistanî çimanê seraya Erdoganî de “baregehê rantî” yo. Coka şeran keno û bi hêzanê bînan hemkarîye virazeno.

**Reftarê PDKyî**

Şerî de pozîsyonê PDKyî zî zaf “balkêş” o. Erdogan şino Hêwler û kurdan ra seba hêrişê vera kurdan hetkarîye wazeno. PDK ewro têkoşînê azadîye rê îxanetê girdî keno. Na partî têna bi “bêrayîrîye” eleqedar bena. Bêguman PDK binê bandora keyeyê Berzanîyan de yo. Tarîxê nê keyeyî de yew merdim est o. Nameyê ci Şêx Abdulselam Berzanî yo. Serra 1907î ra heta 1914î Başûrê Kurdistanî de seba statuyê kurdan xoverayîşêko bêhempa kerd. Hem vera îqtîdarê Abdulhamîdê II. hem zî vera îdareyê Îttîhat û Terakkî zanîyê xo nêronayî. Artêşa tirke zî vera ey teda kerde. Şêx Abdulselam Berzanî seba ke xo bixelisno, şî Rojawanê Kurdistanî û keyeyê Sofî Abdullahî de ca girewt. Gama ke Şêx û merdimê ci rakewtêne, Sofî Abdullahî ê teslîmê tirkan kerdî. Dima ra ame berdene ver bi Mûsil. No dem Mûsil bi destê Walî Suleyman Nazîfî ameyêne îdarekerdene. Nazîfî derheqê Şêxî de mehkemeya viraşte daye kerdene. Axirê Şêx Abdulselam Berzanî ame dardekerdene. Ganî merdim bizano ke Suleyman Nazîf eslê xo ra amedij bî û lajê Saîd Paşayî bî. Saîd Paşa zî kurd bî. Yanî di kurdan azadîya Kurdistanî rê îxanet kerdbî. Ewro keyeyê Berzanîyan rayîrê Şêx Abdulselam Berzanî nê, rayîrê Sofî Abdullah û Suleyman Nazîfî taqîp keno.

# Çarşema Sûre

Valêre

Êzidî yanî qewmo ke raştê 74 fermanan ameyo, qewmê merdimî yo tewr qedîm û kehen o. 3yê tebaxa 2014î de yanî 10 serrî verê cû bi destê DAIŞî û hemkarîya Berzanîyan fermanê 74ine ê êzidîyan ame dayîş û Şingal de qirkerdişêk ame kerdiş. Bi hezaran êzidîyî na roje de ameyî remnayîş û qetilkerdiş. Têgêrayîşê Azadîye 12 esparê xo seba şerkerdişê vera DAIŞî şirawitî Şingal û tena gerîla resaye hawara êzidîyan. DAIŞî waşt ke êzidîyan qir bikero. Bawerî û kulturê înan zî çinî bikero. A roje ra dima û bi serewedarnayîşê Îranî şarê kurdî dinya de veng da û vat ke ma est ê. Her kes zano ke kamî êzidîyî xelisnayî û kamî seba înan xo ver da. Ganî Qirkerdişê Şingalî nêro vîrakerdene.

Badê ke gerîlayan Şingal azad kerd, bi seyan esîrî ameyî xelisnayene la hema zî aqubetê bi seyan êzidîyan nêno zanayene. Hêrişê DAIŞî yê 3ê tebexa 2014î de bi hezaran êzidîyî ameyî qetilkerdene, bi hezaran cinîyê êzidîyî ameyî remnayene û sey koleyan bazaran de roşîyayî. Tena cinî û camêrdî para xo nê fermanî ra nêgirewtê. Domanî zî ameyê rotiş, sey kole ameyê şixulnayîş û sey bombeyo ganî ameyê perwerdekerdiş. Bi hezaran êzidîyê ke ameyî qetilkerdene hetê DAIŞî ra bi komî kommezelan de ameyî binerdkerdiş. Iraqo ke hemkarîya qirkerdişî kerd hema serrra 15ê adara 2019î de bi çimdarîya Neteweyê Yewbîyaye dest bi akerdişê nê kommezelan kerd. Heta nika bi desan kommezelî ameyê akerdiş û cenazeyê ke merdimê ci heme qirkerdiş de dinyaya xo vînî kerdê bêwayîr mendî. Jenosîdê herême ame xerepnayîş û tena merde nê yê ke weş xelisîyayî zî bêwayîr mendê. Nê qewimîyayîşan ra yew zî rojanê verênan de Almanya de vejîya raşte.

Dozgerîya Federale ya Karlsruhe yew hewte verê cû eşkera kerd ke cinîyêke û mêrdeyê aye bi gumanê hêrişê cînsî yê vera 2 domananê êzidîyan û kolekerdişê înan ra başûrê Almanya de tepişîyayê. Dozgerîye bi eşkerayîya çapemenîye vat ke camêrd Twana H.S. û cinîya ci Asîa R.A.ye mabênê serranê 2015-2017î de Iraq û Sûrîye de endamê DAIŞî bîyê. Înan serra 2015 de domanêka êzidî ya 5 serre û dima ra zî domanêka êzidî ya 12 serre kerdê sey koleyê xo û seba her tewir hewcedarîya xo şixulnayê.

**Domanî raştê tecawuzî ameyî**

Dozgerîye vat: “Twana H.S.yî zaf reyî tecawuzê wird domanan kerd. Asîa R.A. zî oda amade kerde û domanan rê meqyaj kerda. Domanê êzidîyî bi zorî goreyê Îslamî ameyê têgêrayîş. Domanan şîdeto fîzîkî yo giran zî dîyê. Serra 2017 de wirdî domanî hetê Twana H.S. û Asîa R.A. ra teslîmê endamanê DAIŞî yê bînan bîyê.”

Twana H.S. û Asîa R.A. hewteyo verên Regensburg û Roth de amebî destbendkerdiş û 10ê nîsane de zî mehkema qerarê tepişîyayîşî da.

**Tirbeya Şêx Adîyî**

Hêrişê vera Şingalî de çeteyan tena zirar nêda gandaran. Zirar da kultur, cayê bimbarek û xoza zî. DAIŞ êzidîyî bi komî kiştî, remnayî, bazaran de rotî, her tewirê koletîye û keyeyê xo de sey kole da şixulnayîş. Vera nê heme tewirê hêrişan de êzidîyan herra xo nêteriknaye, wayîrê bawerî û kulturê xo vejîyayî. Hema zî Şerfedîn yeno zîyaretkerdiş û tirbeya Şêx Adîyî ser de dua yeno kerdiş. Êzidîyanê ke fermanê 74ine û ê bînan de koçê teberê welatî û bajarê bînan kerd bi weşîleya na roja bimbareke agêrenê serê herra xo ya qedîme. Na roja bimbareke rê zî Çarşema Sûre yena vatiş.



**Manaya Çarşema Sûre**

Goreyê êzidîyan dinya de wext 1ê nîsane de dest keno û dinya na roje de awan bîya. Nê semedî ra êzidîyî aşma nîsane sey dest pêkerdişê serra newîye yanî sey, Çarşema Serê Serre bimbarek kenê. Goreyê êzidîyan dinya 7 rojan de qewimîyaya û goreyê bawerîye sûr Homayî û rengê sipîyî zî Melegê Tawusî temsîl keno. Hake sey sembolanê Çarşema Serê Nîsane yeno dîyîş û goreyê bawerîye dinya verê cû hakêke nepewte bîya û dima zî gan kewto zereyê hakî. Adir zî goreyê bawerîye pakî yo û bi tafînayîşê adirî tu xirabîyêk nêreso înan. Yanî adir goreyê bawerîye xirabîye ra pawitiş.

**Bawerîye ra tawîz çin o**

Tena êzidîyî nê teberê welatî ra zî xerîbê ke na bawerîye meraq kenê û her çar hetê Kurdistanî ra şar na roje de herikîyeno Şingal. Şingal sey cayê bîyayîşê merdimîye yeno zanayîş û sey şaro tewr qedîm yeno zanayîş. Her çend ke êzidîyî 74 fermanî ra derbaz bibî zî hema zî serê payan de yê û bawerîya xo ra tawîz nêdanê.



Canê Pasûrij

# Welat de huyayîşêk

Şarê ma huyayîş xo vîr ra kerdbî. Her çiqas ma rojanê cuyayîşê xo de bihuyê zî la reyna hende huyayîşêko weş çin bî û ma pêrinan xo vîr ra kerdbî. Zimistan senî ma ser ra vîyart û dinya hêdî hêdî bîye germ. Tedir boya însanî vecîna. Sey zimistanî, rewşa Tirkîya zî ver bi germîye şina. Qet anu nêbo zî bi bawerîyêka pîle ma pêro anu qebul kenê û wazenê.

Ewro zimistan tenê zerre de vindertiş nîyo. Vowre bivaro, şilî bo, puk bo zî reyna peynîya ci wusar o û hêvî ya. Beno ke merdim serê de tengasî bianco, la bi hêvîya rocanê weş, rocanê geşan û bi xoverdayiş merdim xo mîyanê wusarî de vîneno. Şarê ma bi hesreta rocanê weşan o. Zimistan bi tedarîk, wusar bi xoverdayîş û amnan bi huyayîş derbas beno. Şar hesreta xeylê çîyan mendbî. Emsar zimistan ma pêrinan ser o xeylê weş derbas bî. Puk çinbî, vowre çinbî û tenê şilî, bi aye zî bi rehmet bîye.

Weçînayîşê herêmî zimistan de dest pê xebata xo kerd û hetanî serê 31ê adare de qedîya. 1ê nîsane ma rê destpêkerdişê Tirkîyaya newî bî, wusar ma rê bi bedelnayîşê germî dest pêkerd. Hetanî na roce xeylê merdiman huyayîş kerdbî xo vîr ra. Tenê huyayîş nê, heme şarî qeybî zulm û zordarîye, tu çîyêk cuyayîşê xo ra nêdîbî. Ma pêrinan dî ke serê de ma muhtacê huyayîşêkî bîyî. O huyayîş ma rê bî sembol, ma rê bî rayber. Ne zimistan mend, ne zî zordarî. Ma heme dejê xo, acizîya xo, şikîyayîşê xo bi huyayîşêk kerd xo vîr ra. Serkewtişê weçînayîşî hende omid eşt mîyanê şarê ma. Şar xo bi xo bawer bî. Dest û linga xo, şayîya xo ver û verva zulmkaran vindertişêko berz, vindertişêko bibawerî nîşan da.



Weçînayîş de şarê kurdî îradeyê xo girot dest. Înanê ke bi zordarî şaredarîyî xesp kerdî, bi anu şîyî ke qet pêyê xo ra nêewna, qet pêyê xo nêziviryayî. Şarî îradeyê xo vet orte, la girotişê tay heqan bi rehetî nêbî. Qewetê şarî una eşkera bî ke hukmatî netîceya weçînayîşî çiqas bi dek û dolaban waştêne bibedelno, reyna zî serkewtiş ê ma bî û huyayîş ê ma bî. Bi hîleyan, bi dizdîye, bi her hawayî waştêne vengê şarî, îradeyê şarî vînî bikerê, la nê bi waştişê înan ca nêgirot. Hesap de huyayîş çin bî. Sey tutêkê qicî, ti destê ey ra nanê ci bi zorî bigêre/bigêrî go tut hetanî nanê xo to ra nêgêro go bibermo. Emsar şarê kurdî pêro pîya wayîrê îradeyê xo vecîya, sey tutêkê qickekî bi huyayîş û bi xoverdayîş heqa xo gırote dest.

Ewro yew tutêko qickek verva zulmkaran eşkeno bihuyo. No omid tenê bes o û şarî zana ke çiqas biqewet o. Zimistan tedarîk bî, şuxul bî; wusar xoverdayîş bî, amnan nika bi huyayîş yeno. Yew huyayîş ra pey ma pêrinan zana ke çiqas ma biqewet ê. Eke ma biwazê, yew nêeşkeno verva ma vindero. Nika şarê kurdî pêro pîya huyeno, bi vengê berzî huyeno, bi vengê nizmî huyeno. Qet çin bo bi çiman zî huyeno.

Ma no çî dî, ma muhtacê ne daîre ne zî meqaman ê. Ma tenê muhtacê yew huyayîşî yê. Şar wazeno wa bajarî bibedelîyê, bibê sey înan. Hetanî nika bajarê ke şar tede cuyeno ci rê zî xerîb bî, la nika dest erzeno çiyo ke ê ma yo. Êyê ke mîyan de xerîb bîyî, şarî bi huyayîşêk qevernayî û şîyî.




# Tiştanok (mamik)

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e û berê di civat û şevbêrkên xwe de mamik ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanok anku mamikên xweş amade kirine.  Em hêvî dikin ku bi dilê we be.

***1-Mamê mino***
Sor û spî rengîn e
Bejin dirêje xemgîn e
Şewqa xwe direşîn e
Pîrozeke şermîn e
Ew çi ye?

***2- Mamê mino***
Kalê pîr
Li civata Mîr
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
**1-** Mûm **2-** Çaydank


# Textoriya Heso

**Hesen Hemkê**

Li Sûriyeyê buhayê tehlîlên xwînê gelekî buha bûne, lewre Heso rêbazeke bêpere ji bo tehlîlan dît û bi dost û cîranê re parve kir. Rêbaza Heso ya tehlîlan bi kurtasî wiha ye. Heso dibêje biçe bin darekê bi ser giyayê de mîz bike. Paşê li mîza xwe binêre heke gêrik li ser civiyan wê gavê şekir bi te re heye, heke giya şewitî û hişk bû wê gavê xwêya xwîna te zêde ye. Lê heke bêhnekî şewitî ji mîza te hat zanibe ku kolistrola te zêde ye û heke bîna tiştekî nehat te zanibe tu bi korona ketiyî û bîna tiştekî nayê te.
A ji te re tehlîla belaş û encamên wê ji sed sed rast.



# XAÇEPIRS



## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ DE

**3-** Berevajî germ **5-** Elem, keder **7-** Ne kedî **8-** Cînavkeke pirsiyariyê **9-** Bîrewer, zelal, rewşen **13-** Şûn, şop **14-** Bajarekî bakurê Kurdistanê **16-** Derew **19-** Fikir û ramanê der barê mijarekê de **20-** Sewaleke ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin **21-** Raz **22-** Hêsîr, girtî **25-** Daçekek **26-** Demsalek **28-** Astengî

## JI JOR BER BI JÊR DE

**1-** Bendewar
**2-** Ji ber ku
**3-** Noteyeke muzîkê
**4-** Rengek
**6-** Alaveke mirov li ser rûdinê û carnan ji bo wê şer û pevçûn derdikevin
**10-** Alaveke muzîkê
**11-** Keser, keder
**12-** ezman
**15-** Ne tijî
**17-** Kesên bê dê û bav
**18-** Ne giran
**20-** Kewa mê, mêkew
**23-**Şînahiya ku zebeş û petêx lê dikevin
**24-** Xebat
**27-** Bersiva neyênî

## Bersiva hefteya borî





Dildarê Amedê

# Dengdana bê muxalefet

Kurdên me ji ber ku nebûne desthilatdar her dem di nava muxalefetê de cihê xwe girtine. Îca di van hilbijartinên herêmî yên dawî de li hin şaredariyan li gorî rêjeya dengan DEM partiyê hemû encamên meclisa şaredariyê bidest xistine.

Li hin şaredariyên ku muxalif hebin jî kesek du kes in ew pepûkan dengdana wan hebe tune be ferq nake, lê dîsa jî muxalefet hebe dengdan bêtir bi kelacan derbas dibe. Ne wekî şaredariyê ku hemû encumen bidest xistine û di hemû biryaran de bi yek dengî hema tev dibêjin erê.

Ê de wiha jî nabe ha, wele carnan hema tenê ji bo nebêjin bi yek dengî hate pejirandin moçikên min ê muxalefetê radibin ser xwe û dihêlin ez tev li wê dengdanê nebim. An jî kaxiza li ber xwe vala dixime nava zarfê.

Heyra ne sûcê me ye em hîn nebûne ku tiştekî bêjin an jî bikin bêyî ku çend kes li dijî wê derkevin û her yek pêşiyarek bi rengekî din bike.

Mirov gotina xwe bike yek başe lê wiha jî hema ji koranî ve mirov tev bêje erê ji bo hin tiştan bi min çewt tê.

Diçin û tên û dibêjin îro civîna meclisê ye. Civîn li ser civînê tê kirin û kambaxiya ku qeyûman li şûna xwe hiştiye paqij nabe.

Wan bêbavan di nava 8 salên dawî de tu karek nekirine ji bilî dizî û bêrêtiyan û şaredarî veguherandine şirketa xwe ya malbatê. Ne tenê zarokên xwe û pismamê û dotmanên xwe wan heta bi xesiyên xwe jî kirine kar. Neyse em vegerin meseleya xwe.

Camêr û ciwanikên endamên meclisa şaredariyê tev derbasî salona cihê civînê dibin. Birêveberên danişîna meclisê tevî 2 katibên xwe yên wekî milyaketên ku xêr û gunehan dinvîsin yek li rastê yek jî li aliyê çepê rûdinin.

Civîn dest pê dike, birêveber hin tiştan wek selewatên erebî li ser hev dibêje di nav de gotinên parsel marsel hene. Made qanûn û hevoka dawî tenê tê fêmkirin. Hevoka dawî ev e em vê pêşniyarê ji bo dengdanê pêşkêş dikin. Yên dibêjin erê, yên dibêjin na û paşê di bin çavan de li meclisê dinêre û dibêje:

-Biryar bi yekdengî hate qebûlkirin.

Ê hema bi Xwedê vir e ma ji ku bi yekdengî hate qebûlkirin, hema min destê xwe hilneda. Ji ber ku min fêm nekir çi dibêje min destê xwe ranekir û min li derdora xwe mêze kir çend kesên din jî destê xwe ranekirin. Îca çawa bi yek dengî hate qebûlkirin.

Pêşî min digot qey ez tenê wiha me, tiştekî ji van pêşniyaran fêm nakim paşê min dît ku ji sedî 99 ji endamên meclisê wekî min in û ji sedî yekê mayî jî ne ji ber ku jê fêm dike, ji ber ku berê jî endamtiya meclisê kiriye û wiha fêm kiriye ku çi pêşniyar hate kirin bêje erê.


Îca bi hersê navê Xwedê halê me ne tu hale û Xwedê dawiya me bi xêr bike. Ditirsim dawî her yek ji me bi dehan doz li wan vebin û bêjin we ji filan tiştî û bêvan tiştî re gotibû erê û pejirandibû. Îca em hezar sondî jî bixwin em nikarin wan qayil bikin ku haya me jê tune ye me ji çi re gotiye erê.

Lê ez birê we me ez dest ji muxalefetiya xwe bernadim û qet destê xwe ranakim , hema bila hesab bikin ku ez ji partiyeke din im û vê biryarê qebûl nakim. Lê ew mixalefetiya min ji tiştekî nade guhertin encam her ew e 'bi yek dengî hate qebûlkirin'.


Îca ditirsim rojekê ev muxalefetiya min bibe bela serê min, ez heta niha bi dizî wê yekê carê dikim lê heke bi min bihesin wê navê min li her derê belav bibe.

# Di serdema Mezolîtîkê de pêşketina çandî

Mezolîtîk, serdema derbasbûna çandî ya ji Paleolîtîkê ber bi Neolîtîkê ve ye. Di vê serdemê de hişmendî û binesaziya çandî pêş dikeve. Cara yekem niştecihî, kedîkirina sewal û nebatan, rista jinê, malbatî û di warê sêhr û hunerê de pêşketin çêdibin



Rohat Bulut



Ji roja me ya îro gelekî dûr di serdemên kevnar ên dîrokê de bi pêşketina hişmendiya mirov ve şert û mercên jiyanî, çandî û civakî pêş dikeve. Her çiqas ev dem serdem ji me dûr be jî bi dane û delîlên ku ji aliyê mirovên zanist ên arkeolog, antropolog û dîroknas ve hatine kifşkirin û aşkerakirin gelek aliyên tarî ronî dibe. Em di vê nivîsê de serdema Mezolîtîkê û pêşketina çanda wê demê binirxînin. Mezolîtîk, (mezo=navber, navîn) serdemeke navîn e; qonaxa derbasbûna çandî ya ji Paleolîtîkê ber bi Neolîtîkê ve ye. Li gorî serdema Paleolîtîkê serdemek pir kurt e. Li gorî nêrîna hevpar a pisporan, Serdema Mezolîtîk li Rojhilata Navîn nêzî 17-18 hezar sal berê dest pê kiriye û tenê çar-pênc hezar sal domiyaye. Di encama germbûna gerdûnê û guherîna avhewayê de guherînên ekolojîk û jiyanî pêş dikeve. Ev guherînên jiyanî yên mirov di bingeha xwe de pêşketina çanda mirov û civakî nîşan dide.

**Formên yekem ên niştecihî**

Bi dawîbûna serdema qeşayê ya dawîn re, di avhewa, hawirdor û asta avê de guhertin dest pê dike. Ji ber vê guherînê daristan ber bi tunebûnekê ve diçe. Daristan mêrg û deştê jî di nav xwe de dihebîn e. Di encamê vê guherînê de jimara sewalên mezin kêm dibe; Ji ber ku mêrg û giya û çavkaniyên avê yên ku li ser wan diçêriyan diqediyan. Lewma jî ev sewalên mezin an tune dibûn an jî koçî deverên din dikin. Ev rewş nêçîrê her ku diçe dijwartir dike; Berhevkirin û nêçîrvanî derdikeve pêş, nemaze masîgirtin dibe çavkaniyeke girîng a debarê. Ligel vê yekê, formên yekem ên jiyana rûniştî jî derdikeve holê. Bi piranî niştecihbûyîn ji gundên piçûk pêk tên û li ser rêyên avê û peravên golê dihatin avakirin. Îro jî em rastî şopên wê demê tên.

Dema ku em li taybetmendiyên erdnîgariyê dinêrin, em dikarin baştir fêm bikin bê ka çima qonaxa çandî ya Mezolîtîkê li Rojhilata Navîn dest pê kiriye. Jixwe em dibînin ku erdnîgariya “Hîlala Zêrîn” ku qonaxa çandî ya Neolîtîkê lê geş bûye, li ber çavan dest pê kiriye. Her wiha kêmbûna nêçîrvaniyê û serdestiya masîgirtin û komkirina li şûna wê, dide xuyakirin ku binesaziya birdozî a Şoreşa Neolîtîkê û binesaziya wê di serdema Mezolîtîkê de dest pê kiriye.

Di vê serdemê de em rol û misyona xwezayî ya jinê ku pêş dikeve jî dibînin. Her ku jin di civakê de zêdetir girîngiyê digirin, bingehên madî yên şoreşa zayendî ava dibin û xurt dibin. Di vê serdemê de jin serweriyê ji nêçîrvan werdigirin. Lewre nêçîrvan di her kêliyê de jîr, ji kuştinê re amade û ji ber karê xwe xwediyê cewherek bêrihm e.
Lê belê jin jiyaneke tebat diparêze û dipejirîn e. Lewma jî bi zarokên xwe ve girêdayî ye ku her cûre pitikan diparêze û dimêjîn e. Ev jî nîşan dide ku bingeha avakirina çanda civakî bi destê jinê wate û girîngiyê digire.

**Kedîkirina sewal û nebatan**

Serdema Mezolîtîkê di heman demê de serdemek e ku tê de şert û mercên xwarinê bi qasî serdemên berê zêdetir bû. Ardkelog bi delîlan destnîşan dikin ku rûniştina daîmî yanî niştecibûyîn yekem car di serdema Mezolîtîkê de qewimiye.

Di van niştecihên pêşîn ên serdema mezolîtîkê de, delîlên paqijkirina erdê ji bo armancên çandiniyê, yekem car hate dîtin. Bi heman awayî, diyardeya kedîkirina ajalan nîşan dide ku di vê serdemê de dest bi kişfkirinê kiriye, li ser bingeha bermahiyên sewalan ên wekî beraz, mirîşk, qaz û werdek ku li van gundikên piçûk hatine dîtin. Jixwe nêrîneke bi giştî heye ku hevalên mirovan ên herî kevnar kûçik bûye.

Wekî din jî di cotyariyê de tê tîtin ku rakirin û çandina darên fêkiyan ji hêla mirovên serdema Mezolîtîkê ve - berî Neolîtîkê- hatine kifşkirin. Dane hene ku di wê serdemê de darên hejîr, zeytûn, xurme, sêv û rez bi vê rêbazê hatine belavkirin. Helbet daneyên ku hatine bi destxistin jî wekî cih Rojhilata Navîn nîşan dide.

Bi veguheztina hêza dest û masûlkeyê di hêz û avantaja tîr-kevan û feqan de mirov dikare encamên nêçîrê yên dewlemendtir bi dest bixe. Ev rewş li gel geşedanên di warê çandinî û komkirinê de, ne tenê dibe sedema pirbûna çavkaniyên xwarinê û pêşkeftina çanda xwarinê, di heman demê de bandorek mezin li ser mejî dike û di pêşxistina çalakiyan de ristekê dilîze.

**Pêşketina malbatî**

Di warê jiyana civakî de jî pêşketin çêdibin. Her ku civak mezin dibin, pirsgirêkên rêveberî û serokatiyê jî xwe didin der. Di vê serdemê de baweriya xwe parastin, zikê xwe têrkirin û hêviya pêşerojê zêdetir dibe. Dabeşkirina kar a di navbera zayendan de her diçe pêş dikeve. Kon an jî stargehên darîn têne çêkirin û hişmendiya malbatî û avakirina malbatê dest pê dike. Di asta rewşenbîrî-birdozî de, di warê olî, sêhr û hunerê de pêşketin çêdibin.

**Dirêjbûna temenê mirovan**

Bûyerên wekî zêdebûna civînên merasîman, peyekerên venus û xwedawendên zayînê cara yekem di vê serdemê de wekî îfadeya îdeolojîk û hişmendiyeke têgihiştî derdikeve pêş. Dîsa, ji ber nermbûna avhewayê, diyardeyên wekî pirbûna mêrg û daristanan, kedîkirina sewal û nebatan, hewldanên ji bo jiyana bicîbûyî, zêdebûna cureyên xwarinê dibe sedema dirêjbûna temenê mirovan jî.

## Aforîzma

G. K. Chesterton

**Romana baş rastiya serlehengê xwe vedibêje, romana nebaş rastiya nivîskarê xwe vedibêje.**

**Yên bi rastî jixwebawer in hemû li şêtxaneyan in.**

**Rojnamevanî ew e ku tê gotin “Lord Jones mir” ji wan kesan re yên ticarî nizaniye ku Lord Jones hema her hebûye jî.**

## Gotinên pêşiyan

**Kes nakeve gora kesî. Kes nabêje dewê min tirş e. Ji hemû hêkan çêlik dernakevin.**



# Eleqeya ji bo Mîhrîcana Şanoyê zêde ye

Servîsa Çandê

9’emîn Mîhricana Şanoyê ya Amedê ku bi pêşengiya Şanoya Bajêr a Amedê û bi hevkariya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê tê lidarxistin, bi kelecaneke mezin li Qesra Îskender Paşa ya li navçeya Sûr a Amedê starta xwe da. Mîhrîcan ku di 18’ê nîsanê de bi dirûşma “Bi Hebûna xwe, bi Xwebûna xwe” starta wê hat dayîn, rastî eleqeyeke mezin tê. Mîhrîcana dê heta 27’ê nîsanê bidome. Li gorî organîzeyê dê 19 lîstikên bi 2 zimanan derbikeve pêşberî şanohezan. Her wiha dê bi gotûbêjan jî rewşa şanoya kurdî ya li 3 aliyê Kurdistanê û dîasporayê û ji bo pêşketina şanoya kurdî nîqaş bên kirin.

Bernameya Mîhîrcanê di 18’ê nîsanê de li Qesra Îskender Paşa dest pê kir û dê heta 27’ê nîsanê jî li Çand Ma’yê gotûbêj, li Navenda Kongreyê ya ÇandAmed û Eywana Şanoya Bajêr a Amedê jî lîstik bên lîstin. Her wiha lîstika herî dawî ya mîhrîcanê Gomîdas ku behsa jiyana ermenekî dike, dê li Dêra Ermenan a Surp Giragos bê lîstin û mîhrîcan dê bi vê lîstikê bi dawî bibe.

Dê di mîhrîcanê de ku komên şanoyê yên bajarên Kerkûk, Duhok, Urmiye û Seqiz ên Kurdistanê jî derkevin ser dikê. Ji 19 lîstikên mîhrîcanê 5’ê ji wan bi tirkî û 14’ê wan jî bi kurdî ne. Mîhrîcan, piştî bernameya vekirinê bi performansa komên şanoyê yên Yenî Sahne û Şermola Performansê dest pê kir. Di mîhrîcanê de lîstikên Buka Lekî (Şermola Performans), Afet Île Dîana (BGST), Salma (Koma Hawar), Derwêşyan Gudû (Duhok), Efsaneya Hespên Azad (Ûrmiye), Kabîl û Habîl (Koma Rîtûel), Odip (Koma Ronya-Seqiz), Kral û Travîs (ŞanoAr), Çînûr (Teatra Ba), Zîd û Han (Dubare Kumpanya), Mirina Jeanne D’arce ya din (Şanoya Bajêr a Amedê), Ceyran (Teatroger), Strip-Tease (Dimilki-Şanoya Bajêr a Amedê), Kalabalik Tiyatrosû (Fiziksel Tiyatro Araştirmalari), Bernarda (Tiyatro Proje No2), Înfaz (Şaneşin Performans), Otopsî (Golge Tiyatro Toplûlûgû), Gomîdas (Yolcû Tiyatro) bên lîstin.

## Ferheng



## Antropomorfîzm

**Veguheztina çawanî û wasfên mirovî ji hebûneke din re nemaze Xwedê.**

**Ev sêwirana ku bi mirovên destpêkê dest pê kir, pêşî bi dîtina tiştên bêcan wekî zindî dest pê kir. Paşê, wek ku di mîtolojiyên cihêreng de tê dîtin, şekl û xisletên mirovî ji xwedayan re hatine girêdan. Ev têgihiştin di nav yewnaniyên kevn de dest pê kir, dema ku Homeros û Hesîodos li ser xwedayan di şeklê mirovan de û bi taybetmendiyên mirovî difikirîn. Xwedayên mîtolojîk ên Homeros-Hesîodos, mîna mirovan; Evînê dikin, dihizirin, çavnebariyê dikin, diêşin û lingên hev dişemitînin. Sedema vê têgihiştinê jî meyla yewnanan e ku her tiştî zindî û livîn dihesibînin û şopa anîmîzma primitive li xwe digire. Mînakên antropomorfîzmê di olên xwedayî de jî têne dîtin. Mînak, terîqeta Andiyan (Andians) a Xirîstiyantiyê pêşniyar dike ku peyvên pirtûka pîroz bi rastî fêm bikin û wek mînak peyva “destê Xwedê” ne bi wateye bandor di nav mirovan de bi wateya “sor” fêm dikin. Di îslam û cihûtiyê de jî ev yek bi awayekî sergirtî pêk hatiye.**

xwebûn

22 - 28 Nîsan 2024 / e-mail: rojname@xwebun.org / Hejmar: 227

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Fırat mahallesi 499/1. SK 100 Evler Sitesi No: 6 F **Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Darê

M. Alî Ertaş



Mezopotamya ango welatê jiyanê. Welatê şaristaniyê û bingeha bajarvaniyê. Jiyana mirovahiyê li ser axa Mezopotama dest pê kiriye û mirov li vir bi dar, ber û sewalan re hev nas kirine. Her çiqas li dijî vê yekê angaşt hebin û hin kes bawer nekin jî, dema mirov li ser axa Mezopotamya digere û çav davêje berhemên dîrokî; wê demê bi hemû herhem û bermahiyên xwe şik û gumanên di hişê mirov de zelal dike. Ji bo em van şikan ji hiş û serê mirovan derxin û nerîna wan a li ser destpêk û koka dîrokê zelal bikin. Werin em bihevre berê xwe bidin Gundê Darê ku di navbera Mêrdînê û Nisêbîna rengîn de wenda bûye. Em bihevre biçin bajarê kevir û xwe û li şûnwarê xwe bigerin û nas bikin.

Beriya ku mirov dikeve nava bajêr dîwarên beden û bircên bajêr di nava şînahiya baxçeyên zeytûn û rezên tirî de ber bi ezman radipelikin. Her ku mirov nêzî gund dibe, bêtir şekl û şemalê birc û bedenên bajêr xwe kifş dikin. Xaniyên gund ku ji kevirên xerabeyên bajêr hatine ava kirin jî, mirovan bi zindîbûna xwe pêşwazî dikin. Ev bajarê ku niha gund e, ji dûr ve wekî xerabeyan tê xuyakirin. Bajarê ku di hundirê kevir de ava bûye, mirovan sermest dihêle. Bi ostatiyek mezin û hunerek pir bedew, sebrek pir zêde hatiye kolandin. Ev bajar, çend salan û ji aliyê çend hezar kesan ve hatiye kolandin tenê mirovên wê demê zanin.

Her çiqas ew bajar zêde nahatibe nasandin jî di dema xwe de stêrka bajaran bû. Di wê serdemê de teknolojî û mîmariyek wisa bilind hatiye bikar anîn, eşq û heyraniyek bêsînor bi mirovan re çêdike û mirovan dikşîne nava dilê xwe. Di wê demê de li bajêr pergala şibakeyên avê, pergala sarinç, kêsîn (Kanalîsazyon) aşê avê, zindan, depo (embar) pir û salona şanoyê hatine ava kirin.

**Tê gotin ku yekem car mirov li wî bajarî bi cih û war bûne. Ev bajarê ku ji aliyê mirovan ve di sınga kevirê spî de hatiye kolandin, destpêka avakirina bajarvanî û niştecihbûnê ye. Ev bajarê ku nayê dîtin û nayê naskirin bajarê Darê ye**

### Bi kolandinê hatiye avakirin

Tê gotin ku yekem car mirov li wî bajarî bi cih û war bûne. Ev bajarê ku ji aliyê mirovan ve di sînga kevirê spî de hatiye kolandin, destpêka avakirina bajarvanî û niştecihbûnê ye. Ev bajarê ku nayê dîtin û nayê naskirin Bajarê Darê ye. Bajarê Darê ku niha tenê wekî gund maye beriya zayinê bi çend hezar sal hatiye avakirin ne diyar e. Lê tenê tê zanîn ku ji aliyê mirovan bi destê mirovan ve bi kolandinê hatiye avakirin.

Li vî bajarî ne beton, ne çîmento û ne jî hesin hatiye bikar anîn. Latê sipî hatiye kolandin û bajar di hundirê zinaran de hatiye kolandin. Mirovan bi hezaran sal berê bêyî ku xwezayê biêşînin û bêyî ku hevkêşiya ekolojiyê xera bikin bi kevir, dar û ber re hevaltî kirine. Her wiha keviran jî ew parastine. Tenê ked, sebr, tifaqî û jiyanek hevpar bûye sedema avakirina vî bajarî.

### Bajarê herî navdar bû

Gundê Darê 30 kîlometre li başûrê rojhilata Mêrdîn dikeve, Di qontara çiyayê navbera Qoser û Nisêbînê de ji keviran hatiye ava kirin. Di dema xwe de bajarê Mezopotamya yê herî navdar bû. Lê niha ji ber qîmetê wî nehatiye zanîn û bûye qada operasyonan kevir li ser kevir nemaye û tev hilweşiya ye. Ev bajarê bêhempa gelek şaristanên wekî Sumer, Akad, Elam, Asûr, Babîl, Grek, Roma û Pers hatine li vir serdestî meşanine û çûne. Her wiha tê gotin ku Ev Bajarê Kevir, ji Îskenderê Mezin re jî bûye wargeh û artêşa Îskender hembêz kiriye û ji dijmin parastiye.

### Li dor bedena bajêr 25 birc hene

Hin çavkaniyên dirokê jî dibêjin ku Bajarê Darê ji aliyê Hikûmdarê Îranê Darayuvaşî ve hatiye ava kirin. Gelek caran di navbera Îran û Romayê de dest guhertiye. Wê demê gelek şûr û rim li ser singa Darê hatin kişandin. Gelek xwîn li ser vî bajarî hatiye herikadin. Bajarê Darê piştî sedsala VII'an ketiye destê Emewîyan û piştre jî ket destê Abbasîyan. Di sedsala XV'an de jî ket destê tirkan. Her çiqas gelek netew û miletan serdestî li ser vî bajarê dîrokî meşandibe jî, mirovên wê demê evîn û baweriya xwe li ser hevir neqiş kiriye. Hêza xwe, zanîna xwe, huner û çanda xwe li ser kevir nemir kiriye û heta îro aniye. Bajar bi bedenan hatiye pêçan. Li dor bedena bajêr 25 birc hene.

### Şikeft

Bajarê Darê di sînga tahtê (lat) nehît de hatiye kolandin. Zikê taht hatiye qelaştin û avahî di zikê taht de hatiye kolandin. Şkeftên ku wekî lûs û hêlînên çivîk û kevokan di dîwarên zinar de hatine kolandin dişibin bajarê kevirî. Taht û zinarê ku nêzî 40 metreyî bilindahiya wî heye, qor bi qor derî di kevir de hatine vekirin û di hundirê tehtê de bi mîmariyek smetrîk û aheng ode hatine kolandin. Di hundirê odeyan û rex dîwarên odeyan de jî gelek gor hatine kolandin û ser deriye goran jî bi perçeyekî kevirê pahn ku wekî dergehekî mezin heye hatiye pêçan. Di zinar de ode û xanî 4 tebeq li ser hev hatine kolandin. Her xaniyek ji 2 an 3 odeyan pêk tê. Di navenda bajarê kevirî de jî qesra 4 tebeq ku wekî dêrê hatiye bikar anîn heye. Li ser deriyê vê dêra 4 qat wêneyên mirovan û pelên tirî hatine kolandin. Her odeyek taq ango paceyek biçûk vedibe hundirê avahiyê û hundir bi tîrêjên rojê ronî dike. Her çiqas derveyî şibakeyê teng be jî her ku şibake ber bi hundir ve dirêj dibe fireh dibe û şewqa tîrêjên rojê li hemû deverên odeyê belav dike. Di qatê binî yê dêrê de dîsa taht hatiye kolandin û wekî perde bi perde kevirên şayîk hatine pêçandin.

Di wê demê de mîmariyek pir bilind û bêhempa hatiye bikaranîn. Malên Bajêr li ser 8-10 km yî belav bûye û ji şikeftên kevir hatiye avakirin. Li aliyekî zinar û taht kolandine mal çêkirine. Li aliyê din di kolandina wan xanî û odeyan de ew kevirên ku wekî qalib derketine, bi wan keviran beden, birc û keleha bajêr saz kirine û afirandine.

### Birc û bedenên Darê

Derdora Bajarê Darê bi birc û bedena ku bi kevirên lehît ên ji zinar hatine kolandin hatiye avakirin. Dirêjahiya Bedena Darê ji 4 hezar metreyan pêk tê. Du deriyê bedenê hene. Deriyek vedibe bakur. Ev derî dikeve çiyê. Deriyek jî vedibe başûr. Ev derî jî derdikeve beriya Binxetê. Li ser bedena bajêr 25 birc hatine ava kirin. Ev birc wekî depoyên erzaq û kuleyên parastinê hatine bikar anîn. Di hundirê bedenan de li ser gir keleha ku bilindahiya wê 50 metreye hatiye ava kirin. Lê roja îro li şûna kelehê tenê kevirên bingehê kelehê maye û li ser bingeha kelehê avahî hatine lêkirin. Di hundirê bajêr de şop û bingehê zindan, sarincên avê û sarayan li ser lingan mane. Gelek dîwarên beden û bircan hilweşiyane û tenê hin perçeyên dîwar li hemberî hemû êrîşan ber bi şînahiya ezman ve serî hildaye û heta îro berxwe daye.

### 15 sarinc li rex hev hatine çêkirin

Ji wê serdemê de pergala hawizê avê û sarinçan pêş ketiye. Ev sarinc, di singa tahtekî (lat) kesp de hatine kolandin. 15 sarinc li rex hev li bakurê bajêr hatine kolandin.

Ji bo vê kolandinê hêzek pir mezin û temenekî dirêj divê. Ev sarinc bi dehan salan ji aliyê hezaran kesî ve bi kedek mezin hatine kolandin. Ji bo vê kolandina van sarincan ne tenê ked, her wiha sebr, zanebûn û berxwedanek mezin jî bi xwe re afirandiye. Wê bawerî, ked, berxwedan û eşqa mezin li pey xwe berhemek wisa dîrokî û bêhempa afirandiye. Ev sarincên ku di tehtê de hatine kolandin bi kevirên mezin û şeh kirî bi avayekî glover hatiye pêçan. Piştî ser sarincan hatiye pêçan ketiye şiklê erdzemînê. Bi vê sergirtina sarincan ava sarincan ji germa, serma û qirêjiyê hatiye parastin.

Van sarincên ku dirêjahiya van 50 metre, firehbûna wan 5 metre û kurbûna wan nêzî 10 metreyan e, wê demê hemû pêdiviyên bajêr yên avê temîn dikir û av li hemû devera bajêr belav dikir. Havînan av cemidî û zivistanan jî av germ dihişt. Ev sarinc çavkaniya xwe ya avê, bi qanalek avê ku 12 kîlometre bi Kaniya Bazinan ve tê girêdan digirt.

### Li ser 16 stûnan zindan lêkirine

Li ser zindana Darê gelek çîrok têne gotin. Hin kes dibêjin di destpêkê wekî sarinca avê dihat bikaranîn.

Hin çavkanî dibêjin wekî depoya erzaq dihat bikaranîn. Lê belê di sedsalên dawî de tê zanîn ku wekî zindanê hatiye bikar anîn. Her çend çîrok li ser hatibin gotin jî her miletekî li gorî pergal û berjewendiyên xwe ev berhema cihêwaz bikar aniye. Ev zindana bê hempa ji ber bedewbûna xwe û mezinbûna xwe mirovan matmayî dihêle. Zindan di bin zikê erdê de hatiye kolandin û lêkirin. Di ketina deriyê zindanê de salonek zirav û dirêj derdikeve pêşberî mirov. Kûrbûna vê zindanê ji 40 metreyî pêk tê. Firehbûna wê 10 metre, dirêjbûna wê jî ji 30 metreyî pêk tê. Li ser 16 stûnên stûr hatiye lêkirin. Her wiha ji bo daketina hundir pêwiste mirov 55 pêpelikan dakeve û hilkişe.

Ev zindana ku di bin zikê erdê de veşartiye, heta çend sal berê hundirê wê tijî xwelî bibû û wekî gova pez û axurê çêlekan dihat bikar anîn. Piştî paqijkirinê û şunve hêdî hêdî bala mirovan dikşîne ser xwe û dibe çavkaniya turîzmê.

Lê mixabin ev bajarê dîrokî ku çand, huner, hêz, zanist, mîmar û keda mirovahiyê tê de veşartî piştî ket destê Osmaniyan û Dewleta Tirkiyeyê bê xwedî hate hiştin û bi xerakirinê re rû bir û ma.

Ev devera dîrokî ku wekî destpêka şaristanî û bajarvaniyê tê zanîn ji ber bê xwedîtiyê di sedsala dawî de wekî gov û axur hate bikaranîn û tev hilweşiya. Dîrok ji ber bêxwedîtiyê ji rûpelên dîrokê derket û winda bû.